

# DERHEQÊ XEBATANÊ ZIWANÎ DE ÇEND NOTÎ<sup>1</sup>

Roşan Lezgîn

Xebata ziwani de tecrubeyê miletanê bînan ra xebardar biyayiş, îstîfade kerdiş zaf baş o, la motamot teqlîd kerdiş raşt nîyo. Çimkî her millet îhtîyac û şert û îmkananê xwu gore û ancax bi qabilîyet, zanayiş û metotanê mexsûsê xwu bixebitîyo. Eke merdim bala xwu bido xebatê ke miletanê bînan ziwani xwu ser o kerdê, feydeyê xwu beno. Coka ma bineyke bala xwu bidin xebatanê tirkî ser, dima zî tayê hetan ra xebata standardkerdişê kirdkî munaqeşe bikin baş beno.

## Ziwan de Safkerdiş

Xebata safkerdiş (özleşirme) û standardîzekerdişê tirkî destpêkê seserra 20. de hetê edîban û roşinbîranê tirkan ra bi hîsanê neteweperestîye dest pêkerd. Ronayişê Tirkîya ra pey, bitaybetî qebûlkerdişê alfabeya latîni (01.11.1928) ra dima, binê hîmaye û serpereştîya Mistefa Kemalî de tirkî ser o xebatêka zaf pête dewam kerde. Labelê rîyê ziwani ser o tetbîqkerdişê nîjadperestîye (ırkçılık) ra, esas wuşkiya Mustafa Kemalî ver nêşkayî hende mesafe bigîrê, bitaybetî serranê 1930an de, hetanî mergê Atatürkî dekewtî yew gerîneka kore mîyan. Badê Atatürkî xebata tirkî ser o bineyke normalîze bîye, tirkîya ewroyî şekil girewt. Falih Rıfki Atay derheqê helwêsta wuşke ya Atatürkî de, epey wext badê mergê ey, vîna vano:

"Atatürk bir müddet dilde en aşırı özleşirme denemelerinde bile bulunmaktan çekinmedi. Bu deneme devri kendini de, bizi de ister istemez bir çıkmaza doğru götürdü. Fakat 'şey' kelimesini dahi Türkçe olmadığı için kullanmamak aşırılığı, bir daha Osmanlıcaya dönülmek imkânlarını bir hayal olarak bile ortadan kaldırmıştır. Bu dar özleşirme sıkıntılarını içinde, bir gün, arkadaşlarından birine bir nutuk söylediğini hatırlıyorum. Hiçbir yabancı kelime kullanmayacaktı. Ayağa kalktı, nutuk bir kekemedan ibaretti..."<sup>2</sup>

Nutqo ke Falih Rıfki behs keno qeyd nêbiyo la enê hetî ra yew xîtabeto balkêş yê Mustafa Kemalî esto. 1934 de prensê Swêdî Gústav Adolf yeno Tirkîya, Mustafa Kemal bi tirkîya xwu ya "pêti" wîna xîtabê ey keno:

<sup>1</sup> Enê notî bi hawayê 8 beşê cîyayî mabeynê tarîxê 15.02.2018-20.03.2018 de keyepelê www.zazakî.net de weşaniyayî. Eno metin de pêro qisimî sey yew metnî kom biyê pêser.

<sup>2</sup> Dilcilere Saygı, Derleyen: Hikmet Dizdaroğlu, TDK Yay. Ankara, 1966, Falih Rıfki Atay, Atatürk ve Türk Dili, r. 9-10

"Altes Ruayâl,

Bu gece, yüce konuklarımıza, Türkiye'ye uğur getirdiklerini söylerken duyduğum, tükel özgü bir kıvançtır.

Burada kaldığınız uzca, sizi sarmaktan hiç durmayacak ılık sevgi içinde, bu yurttta, yurdunuz için beslenmiş duyguların bir yankısını bulacaksınız.

İsveç-Türk uluslarının kazanmış oldukları utkuların silinmez damgalarını tarih taşımaktadır. Süerdemliği, önü, bu iki ulus, ünlü sanlı sözlerinin derinliğinde sonsuz tutmaktadır.

Ancak, daha başka bir alanda da onlar erdemlerini, o denli yaltırlıklı yöntemle göstermişlerdir. Bu yolda kazandıkları utkular, gerçekten daha az özence değer değildir.

Avrupa'nın iki bitim ucunda yerlerini berkiten uluslarımız, ataç özlüklerinin tüm ıssıları olarak baysak, önürme, uygunluk kıldacıları olmuş bulunuyorlar; onlar bugün en güzel utkuyu kazanmaya anıklanıyorlar; baysal utkusu.

Altes Ruayâl,

Yetmiş beşinci doğum yılında oğuz babanız, bütün acunda saygılı bir sevginin söyüncü ile çevrelendi. Genlik, baysal içinde erk sürmenin gücü işte bundadır.

Ünlü babanız, yüksek kralınız beşinci Güstav'ın gönenci için en ıssı dileklerimi sunarken, Altes Ruvayâl, sizin Altes Ruvayâl, prenses Louise, sevimli kızınız Altes Prenses İngrid'in esenliğine, tüzün İsveç ulusunun gönencine içiyorum."<sup>3</sup>

Seke aseno, tirkîya Atatürkî de kelîmeye "tarih" erebkî, "prensens" fransizkî, "kral" sirbkî û "hiç" zî fariskî ra dekewtê tirkî, kelîmeyê bînî, qaşo "öz Türkçe" yê. Labelê o wext zî nika zî kesî enê qiseykerdişî ra fam nêkerdo. Atatürkî hende zor dayo xwu, ancî zî nêşkayo yew xîtabeto qijek bîle tena bi çekuyanê safî tirkî amade bikero.

Wexto ke merdim bala xwu dano kurmancîya enê davîst serranê peyînan yê tayê nuştoxanê ma yê kurmancan, yanî "kurdîya aqademîk"e, eynî sey versîyonê kurdî yê tirkîya Atatürkî eysena. Eke nîsbetê kurmancan de nêbo zî, kirdkîya ma de zî nuştoxê ke bi eynî zîhnîyetî "kirmanckî (zazakî)" nusnenê tay nîyê. Tirkîya Atatürkî de, zafê kelîmeyî viraşte yê la qet nêbo sentaks raşt o, yanî kelîmeyê xwu sîstemê tirkî gore rêz kerdê. İnanê ma de o zî çin o.

Ma kurdî qiseykerdişê zıwanê xwu de rike nêkenê, zaf tay kesî kurdî (kirdkî, kurmancî) qisey kenê. Êyê ke kenê zî, qismêko muhîm tena kelîmeyan ser o neteweperestîye kenê, belkî tirkan ra vêşêr neteweperestîye kenê. Tayê zıwanzanê ma zî wuşkiye de Atatürkî ra vanê ti weta şo.

Safkerdiş û standardîzekerdişê zıwanî bi fehmê tesfîyekerdişêkê teasubaneyê rijî nêbeno, ihtîyac û îmkananê zıwanî gore bi peymê îlmî yê zıwannasîye beno û helbet bi munaqeşeyan aver şino.

<sup>3</sup> Atatürk ve Türk Dili, 2. Cilt, TDK Yay. Ankara, 1997, r. 461-462

## Tirkan û Kurdan de Alfabe

Tayê hetan ra tirkî û kurdî manenê yewbînî, coka merdim bi hawayê têvernayîşî bala xwu bido xebatanê tirkî ser, feydeyê xwu beno. Mesela, ma her di miletan zî gelêk wext alfabeya erebkî şuxilnaya, dima ma vîyartê alfabeya latînî ser. Belkî çend vengî xaric, hema vajêne ke alfabeyê ma tim seypê bîyê.

Bi kilmîye, **alfabe** rêzila herfan a ke pê veng û fonemê yew ziwani nîşan dîyenê. Çekuya "alfabe" yunankî ra yena, nameyê her di herfanê verênan yê alfabeya latînkî "alfa" û "beta" ra ameya pê.

Tu ziwane de yew alfabe tamamê vengê ziwani bêkêmanî nîşan nêdana, tenya vengê ke ser o mutabaqat virazîyayo de fikrêko umûmî dana. Mesela, tirkan û kurdan alfabeya latînî adapteyê ziwane xwu kerda û her di ziwanan de zî fonetîk a, yanî her herfe nîsbetêko zêde de yew veng temsîl kena. La eslê xwu de, qîsmêk herfî neke tena yew veng, çend vengê nîzdîyê yewbînan nîşan danê.

Însanî de sistemê vetîşê vengê zaf dewlemend o, însan eşkeno vengê ke pêro ziwanan de estê ra zêdeyêr vengê vejo. La ziwani winî nîyê, qîmê xwu bi vengê mehdûdan anê û wayirê yew repertuarê vengê yê mexsûsê xwu yê.

Ge-ge termê herfe û vengî eynî mana de yenê şuxilnayîş feqet eynî çî nîyê. Îşaretê ke veng û foneman nîşan danê ra vanê **herfe**. Na rey **veng**, ziwane qiseykerdişî de parçeyo tewr qic ke yeno vatiş û eşnawitiş o. Eno tesnîf hetê fonetîkî ra yo, çimkî qiseykerdiş de vengî cêra nêvisyenê, pêra beste vejîyenê.

Ziwan de vengo tewr qicek ke mana cîya keno ra vanê **fonem** (bi tirkî: *sesbirim*). Xebata ziwani de telafuzê cîya yê eynî fonemî ra zî vanê **alofon** (bi tirkî: *alt sesbirim*).

Tirkîya Anadolî seserra 13. ra îtibaren (1277) ameya nuştîş<sup>4</sup>, coka standardîzekerdişê tirkî hetêk ra xwuvero prosesê tarîxî de ameyo pê. Tirkan alfabeya erebkî farisan ra girewta û pê ziwane xwu nuşto. Alfabeya erebî **28** herfanê bêvengan ra yena pê, alfabeya erebî de herfê vengî çin ê. Badê qebûlkerdişê îslamî, farisan seba ihtîyacîya ziwane xwu bi hîrê nuqtayan û xêzêk alfabeya erebkî de herfê bêvengî **p** (پ), **ç** (چ), **j** (ج) û **g** (گ) ardê pê, bi eno hawa alfabeya erebî adaptayê fariskî kerdbî. Eke ma herfa hemze elîfî (ء) zî bihesibnin, alfabeya fariskî 33 herfî yê.<sup>5</sup> Farisan herfê vengî yê kilmekî bi wasitaya herekeyan, ê dergî zî bi wasitaya herfanê "ء ا و ي" viraştê.

Alfabeya erebî ya tirkî de bi awayêko hîra **37** herfî estê.<sup>6</sup> Herfanê bêvengan de kêmanî çin a la seba ke herfê vengî alfabeya erebî de çin ê, coka nuştîş û wendişê tirkî de teşqeke kêmanî nêbîyo. Tîya de, tena ez yew nimûne dana. Mesela, tirkî de sufiksê viraştîşê sifetan "cı, ci, çı, çi, cu, cü, çu, çü" bi eynî şekl

<sup>4</sup> Dr. İsmail Bangi, Farsça Dilbilgisi (Gramer), Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yay. Ankara, 1971, r. 5

<sup>5</sup> Dr. İsmail Bangi, Farsça Dilbilgisi (Gramer), Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yay. Ankara, 1971, r. 9

<sup>6</sup> Prof. Dr. Hayati Develi, Osmanlı Türkçesi Kılavuzu - I, Kesit Yayınları, İstanbul, 2009, r. 14

sey "جى" (ci) nusîyayê la cîya ameyê wendiş. Nimûneyî: helvacı (حلواجى), gemici (گمچى) mirasçı (ميراثچى), işçi (یشچى), mumcu (مومچى), mühürçü (مهرچى), mektupçu (مکتوبچى), sütçü (سودچى)

Tirkan destpêk de çekuyê ke erebkî û fariskî ra girewtê, sey telafuzê xwu nuştê. La badê ke İstanbul bîyo merkezê kultur û hunerî, edibê tirkan ke zaf baş erebkî û fariskî zî zanê, sey qaydeyî çekuyê erebkî û fariskî orijînalê xwu de senî nusîyenê, înan zî tam rîayetê nuştîşê orijînalî kerdo. Mesela, çekuyê sey "sevâb" (ثواب), "zat" (ذات) de seba ke vengê peltek yê "sê" (ث) û "zal"î (ذ) tirkî de çin ê, xwura tirkî nêşkenê enê vengê vejê, coka çeku sey eslê ci nušta la wendiş de vengê ziwanê xwu, yanî sey sîn (س) û zeynî (ز) telafuz kerdê. Herfa datî (ض) zî wina ya, ena herfe exlebê xwu sey "z" telafuz bîya, la tayê çekuyan de sey "d" zî telafuz bîya. Mesela, sey "huzûr" (حضور) û "kadî" (قاضى).

Alfabeya erebî ke kurdan bikar arda, hema vajêne, eynî alfabe ya. Kurdan zî sey tirkan çekuyê ke erebkî ra girewtê, exlebê xwu sey eslê ci nuştê la sey telafuzê xwu wendê. Mesela, Ehmedê Xasî *Mewlûdê Kirdî* de çekuya "zat" sey (ذات) nušta, çekuya "eser" sey (اثر) nušta.<sup>7</sup> Enê vengê peltekî kurdan de zî çin ê, kurdî zî eynî sey tirkan nêşkenê enê vengê vejê.

Badê ke Tirkîya ronîyaya, tirkan roja 01.11.1928 de alfabeya latînî qebûl kerde. Alfabeya latînî ke tirkan adapteyê ziwanê xwu kerda de enê 29 herf estê: **Aa Bb Cc Çç Dd Ee Ff Gg Ğğ Hh İı Jj Kk Ll Mm Nn Oo Öö Pp Rr Ss Şş Tt Uu Üü Vv Yy Zz**

Ma zî 1931 de eynî sey tirkan alfabeya latînî qebûl kerda. Alfabeya latînî ya ke kurdan adapte kerda, enê 31 herfan ra yena pê: **Aa Bb CcÇç Dd Ee Êê Ff Gg Jj Hh İi Îî Kk Ll Mm Nn Oo Pp Qq Rr Ss Şş TtUu ûû Vv Ww Xx Yy Zz**

Gama ke ma alfabeya tirkan a erebî û latînî danê têver, ma vînenê ke înan herfê alfabeya erebkî "ز ض ظ ذ" latînkî de tena kerdê "Zz", herfê "ه ح ح" tena kerdê "Hh", herfê "ث س ص" kerdê "Ss", herfê "ت ط" zî kerdê "Tt". Ancî, herfê "ق ك" kerdê "Kk" û herfê "أ ع" zî kerdê "Aa". Yanî tirkan 16 herfê alfabeya erebkî alfabeya latînkî de kerdê 6 herfi.<sup>8</sup>

Herfê "Qq" (ق) û "Xx" (خ) xaric, herfê bînî kurdan zî sey tirkan alfabeya xwu ra vetê. Esasê xwu de vengê ke enê her di herfi nîşan danê tirkî de estê la înan bi herfê "K" û "H" kod kerdê.

Gereka ma xwu vîr ra nêkerin, tu ziwano tebîî bi hawayo ke yeno qiaseykerdiş tam winî motamot nênusîyeno û bi hawayo ke yeno nuştîş zî nêwanîyeno. Vengê ke bi herfan yenê nîşandayîş bile, rastîya xwu de vengê fîzîkî nîyê, vengê pêarde yê. Ma vajin, yew çekuya ke fekanê muxtelîfan de bi hawayê cîya-cîya yena vatiş, nuştîşê standardî de bi yew şekl yena nuştîş. Û çekuya ke nuştîşê standardî de bi yew şekl nusîyaya, hetê fekanê muxtelîfan ra cîya yena vatiş.

<sup>7</sup> Ehmedê Xasî, *Mewlûdê Kirdî*, Metbeaya Lîtoğrafya, Diyarbekir, 1899

<sup>8</sup> Osmanlı Türkçesine Giriş - I, Anadolu Üniversitesi Yayını, Eskişehir, 2017, r. 31

Eno çîyo ke ez vana, tena çarçewaya yew ziwani de yo. Mesela, vengê tirkî "İ" yê çekuya "ısı", ancî vengê "Öö" û "Üü" yê çekuya "öküz"î ma de çin ê. Şarê ma ra, êyê ke tirkî nêwendo, çekuya "öküz"ê tirkî sey "okiz" telafuz kenê. Laburatuwar de bi hawayêko hasas tesbît nêbo bile, goşê însani zaf rehet eşkenê ferq bikerê ke enê vengî ma de çin ê. La tayê kesî, bi yew motîvasyonê teberê îlmê ziwani de, bitaybetî nuştîşê zazakî de, enê herfan şuxilnenê. Labelê eke merdim xwu fikrê sîyasî ra dûr bigêro, eks û înad ra zî fek verado, temamen bi hawayêko îlmî biewnîyo, zaf rehet vînenê ke zazakî de şuxilnayîşê enê herfan zerar dano sîstemê fonolojîyê zazakî, sîstemê vengê zazakî xeripneno. Eke ma vajin "Zazalar Kürt değil, Zazaca müstakil bir dildir" zî, ancî ferq nêkeno. Çimkî enê vengî seba vengê ziwani tirkî ameyê kodkerdiş. Mesela, ma çekuya "bira" sey "bıra" binusnin, neslê ma yê neweyî vera-vera do vengê "İ"yê ma sey vengê "Isı"yê tirkan telafuz bikerê. Ancî ma çekuya "gomlek"î sey "gömllek", çekuya "gule" sey "güle" binusnin, zamanî reyde, enê vengê ma yê eslî dejenere benê, xeripîyenê. Çimkî şarê ma mekteban de tirkî wendo û enê herfî seba kamcîn vengê ameyê kodkerdiş, zano. Coka kam ke enê vengê nuştîşê zazakî de şuxilneno, bi hawayêko îlmî îsbatkerde yo ke zerar dano sîstemê fonetîkê zazakî.

Nika ma bala xwu bidin alfabeya latîni ya tirkan û yê ma ser, gelo kamcîn herfe çend vengê senî temsîl kena. Enê vengê ke ez vana, vengê hasasî yê alofonîkî nîyê ke laboratuwar de tesbît bibê, vengê winasî yê ke merdim zaf asan eşkeno bi goşanê xwu cêser bikero:

**Aa:** Ena herfe tirkî de di vengê temsîl kena; çekuya "hâla" (hema zî) de "â"yo şewqayin derg, çekuya "hala" ('eme) de "a" normal o. Tirkan verê cû "â"yo derg tim bi şewqa nuştêne la êdî hende goş nêdanê ci. Alfabeya ma de "a" tena yew veng nîşan dano, yanî ma de "â"yo derg çin o.

**Çç:** Alfabeya tirkan de, tayê cayan de "ç" nusîyeno la sey "c" wanîyeno. Mesela, "*Meriç'i geçtim*" nusnenê la sey "*Meri'ci geçtim*" wanenê.

Alfabeya ma de, belkî tayê fekanê Dêrsimî de yew vengê "ç" ke telafuzê ci de serê ziwani gineno lewan ro bibo, o zî zaf mehdûd o, mumkin o ke tesîrê armenkîya rojawanî ra kewto fekê Dêrsimî.

**Ee:** Alfabeya tirkan de, tayê çekuyan de sey "ê" wanîyeno. Mesela, "bêş (5)", "êl (yabacı)", "êki (2)", "êrken (erken)", "sêkiz (8)", "yêdi (7)". Eslê xwu de vengê "ÊÊ" tirkîya verêne de esto la gama ke înan alfabeya latîni adapteyê ziwani xwu kerda, hewce nêdîyo ke seba enê vengî yew herfa bîne ronê. Labelê kesê ke bi eslê xwu tirk ê, bitaybetî êyê ke mekteban de perwerde nêdîyo, zafê çekuyan de herfa "e" sey "ê" wanenê.

**Gg:** Ena herfe tirkî de di vengê temsîl kena, mesela gama ke vanê "gol" û gama ke vanê "gizli", sîstemê feki de cayê vetîşê ci eynî nîyo. Tayê çekuyan de zî sey "k" wanenê, mesela, "gaz" nusnenê la sey "kaz" wanenê.

**Ğğ:** Ena herfe tayê çekuyan de nusîyena la nêwanîyena, mesela, "soğuk" nusnenê la sey "souk" wanenê, "sığır" nusnenê la "sır" telafuz kenê. Tayê çekuyan de sey vengê "â"yî telafuz kenê, mesela,

"dağ" nusenê la sey "dâ" wanenê.<sup>9</sup> Tayê çekuyan de sey "y" telafuz kenê, mesela, "değer" nusnenê la "deyer" wanenê. Xwura tirkî vengê "ğ"ê erebî sey "g" nusnenê.

Kesê ke vanê "*zazakî zıwanêko mustaqîl o*", qismêkê înan, ena herfe şuxilnenê. La eke merdim bi îlmê zıwanşınasıye biewnîyo, hewceyîya alfabeya ma bi ena herfe çin a. Dades çekuyê ke erebkî ra dekewtê zıwanê ma de eno veng esto, feqet merdim zaf bi asanî eşkeno bi herfanê "g" û "x" binusno, wendiş de ancî sey "ğ" telafuz bikero. Xwura alfabeya latînî ya kurdan bi eno qayde ya.

**Hh:** Ena herfe tirkî de hîrê veng an temsîl kena; çekuya "halay", "hak" û "bahçe" de eynî vengî nîyê.

Ena herfe alfabeya ma de di veng an temsîl kena, sey "heval" û "êhsan"î.

**İi:** Tirkî de di veng an temsîl kena, yew "î"yê tirkî yo, yew zî "î"yê alfabeya ma yo, mesela, çekuyanê "dînî", "fîkrî", "sunî" û sn de.

**Jj:** Eno veng zıwanê tirkan de çin o, dima çekuyanê xerîban ra dekewto tirkî la ancî zî tirkî hem sey "j" hem sey "c" telafuz kenê, mesela, sey "jilet" nusnenê la sey "cilet" telafuz kenê.

**Kk:** Ena herfe çend veng an temsîl kena. Mesela, çekuyanê sey "kar, kara" de sey "ق"yî, çekuyanê "keçi", "kredi" de sey "ك", ancî çekuyanê sey "kafir" de alafonêkê "ك"yî telafuz kenê. Tirkî, tayê çekuyan de zî nusnenê la sey "ğ/y" wanenê, mesela, "Irak'a" nusnenê la sey "İrağ'a" telafuz kenê. Ancî, tayê çekuyan de sey "g" telafuz kenê, mesela, "kaz" (qanze) nusnenê la sey "gaz" wanenê.

Seba ke alfabeya ma de "ق" (q) esto, coka ena herfe vengêk temsîl kena. Labelê gama ke merdim nızdî ra ewnîyeno, tayê çekuyan de, alafonêk zî gêna xwu zere. Mesela, çekuya "kemere" û çekuyanê sey "kafir, kalik, kardî" de eno ferq xwu nişan dano. Coka kesê ke vanê "*zazakî zıwanêko mustaqîl o*" ge-ge sey "khalik" nusnenê. La qet hewce nêkeno wina binusnê, çimkî vengê "a"yî xwura telafuzê "k"yî nermijnenê. Heto bîn ra, seba ke alfabeya ma de herfa "h" di veng an temsîl kena, mumkin o ke wendoxî xelet biwanê. Mesela, mi bi xwu destpêk de çekuya "khalik"î sey "khalik" wendêne, dima mi fam kerd ke seba "k"yî bikerê nerm, "h" ver de nuştê. Heto bîn ra, zafê alfabeyan de "kh" sey vengê "x"yê ma wanîyeno. Enê sedeman ra, seba alafonê "k"yê nermî nuştîşê "kh" zerar dano sîstemê fonolojîyê zazakî.

**Ll:** Ena herfe tirkî de di veng an temsîl kena. Çekuyanê sey "yalçın" û "lapa" de qalind, çekuyanê sey "el" û "litre" de tenik o.

Alfabeya ma de zî di veng an temsîl kena. Mesela, çekuyanê sey "laser" û "lete" de tenik, çekuyanê sey "lamba", "lepik", "lêl" de qalind telafuz bena.

**Nn:** Esasê xwu de tirkî de di vengê "n" estê. Alfabeya Usmanî de "n"yo wuşk bi herfa "ك" sey "بيك" (bin) nuştêne, "n"yo normal zî bi herfa "ن" nuştêne.

---

<sup>9</sup> Doç. Dr. Hülya Pilancı, Türkçe Ses Bilgisi, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2017, r. 13

**Pp:** Tirkî de, zafê çekuyan de sey "b" wanenê, mesela "*Sinop'a gittim*" nusnenê la sey "*Sinob'a gittim*" wanenê. Ancî, tayê çekuyê sey "barmak" û "bastırma" bedilnayê sey "parmak" û "pastırma" nusnenê la zafê tirkan hema zî sey "barmak" û "bastırma" telafuz kenê.

**Rr:** Ena herfe tirkî de di vengana temsîl kena, mesela, "raf, rıza" de qalind, "renk, rey" de tenik wanenê.

Alfabeya ma de zî eynî wina di vengana temsîl kena. Mesela, çekuyanê sey "kerr, serradî, serre" û heta ke "resen, rew, rez" de qalind, la "arêye, erey" de tenik a.

**Ss:** Ena herfe tirkî de di vengana temsîl kena, mesela, çekuya "satır" de sey "ص"î qalind, çekuya "sevgi" de sey "س"î tenik a.

Alfabeya ma de zî bi eynî şekl di vengana temsîl kena. Mesela, manaya "taş"ê tirkî "sîye" de sey "ص"ê erebî qalind la manaya "gölge"yê tirkî "sîye" de sey "س"ê erebî tenik a. Zafê çekuyê ma yê bînî zî bi "s"yê qalindî telafuz benê.

**Tt:** Ena herfe di vengana temsîl kena, mesela, gama ke vanê "tortu, turp" sey "ط"yê erebî qalind la gama ke vanê "titreme" sey "ت" tenik a. Tirkî de, tayê çekuyan de sey "d" zî yena wendiş, mesela, sey "*Murat'a söyle*" nusnenê la sey "*Murad'a söyle*" wanenê.

Ma de zî di vengana temsîl kena, gama ke ma vanê "teyre" sey "ط"yê erebî qalind la gama ke ma vanê "teber" sey "ت"yê erebî tenik a.

**Uu:** Ena herfe zî di vengana temsîl kena, mesela, çekuyanê "gürûh, sükût" de vengêko sey "û"yê alfabeya ma derg o, la çekuyanê bînan de vengêko mabeynê "u" û "û"yê ma de yo.

**Zz:** Ena herfe zî di vengana temsîl kena, mesela, çekuyanê sey "zulüm, zabıta" de sey "ظ"yê erebî qalind, çekuya "zeybek, zemin" de sey "ز"î tenik telafuz bena. Ma de zî bi eynî tewir di vengana temsîl kena.

Çıyo ke aseno, hetê temsîlkerdişê vengana ra alfabeya ma nîsbet bi alfabeya tirkan munasibtir û sadetir a. Ma xwu vîr nêkerin, alfabe de çıyo tewr muhîm eno yo, herfê ke seba ziwanêk adapte bîyê û sîstemê vengana ê ziwanî, gereka yewbînî dir pêkewte bê. Enê hetî ra zî alfabeya ke Celadet Alî Bedirxanî û hevalanê xwu tesbît kerda sîstemê fonolojîyê kurdkî (kurmancî, zazakî) dir zaf baş pêkewte ya.

## **Tesnîfkerdişê Çekuyan**

Ziwanê tirkan ke ewro Tirkîya de yeno qıseykerdiş, seserra 13. ra nat nusîyeno. Hayati Develi "hîna zaf senînîya çekuyan û vurîyayîşê sentaksî" esas gêno û prosesê tarîxî gore tirkîya nuşteki di dewreyan ser o tesnîf keno:

*1-Tirkîya tarîxî ya Tirkîya (Tirkîya Usmanîyan)*

a) Tirkîya verêne ya Usmanîyan: seserra 13. ra hetanî nîmeyê sesera 15.

b) Tirkîya klasîke ya Usmanîyan: nîmeyê sesera 15. ra hetanî sesera 19.

c) Tirkîya newîye ya Usmanîyan: Tenzîmat (1839) ra hetanî serra 1908

*2-Tirkîya newîye ya Tirkîya (tirkîya ewroyine): 1908 ra nat<sup>10</sup>*

Zemanê selçûqîyan de ziwanê resmî û ziwanê edebîyatî yê tirkan fariskî, ziwanê îlmî zî erebkî biyo. Coka her çiqas seserra 13. ra îtîbaren (1277) êdî tirkî tercîh kerda zî tirkîya înan hem hetê qeydeyanê ziwanî ra hem hetê çekuyan ra binê tesîrê fariskî û erebkî de bîya. Badê pey, hîna zaf fransîzkî, înan zaf ziwanan ra çekuyî girewtê.

Tirkan badê qebûlkerdişê alfabeya latînî, bi talîmatê Atatürkî, roja 6 temûz 1932 de "Türk Dili Tetkik Cemiyeti" na ro û bi hawayêko sîstematîk xebitîyayî ke ziwanê xwu bikerê saf tirkî, yanî çekuyanê erebkî û fariskî tirkî ra vejê, herinda înan de çekuyanê neweyan virazê. Helbet qeydeyê nuştîşê ziwanê xwu, ancî alfabeya newîye gore gereka çekuyî senî binusîyê ser o zî qerarî girewtê û tetbîq kerdê.

Xebata safkerdişê (özleştirme) tirkî de înan epey mesafe girewt. Mesela, çapê serra 1988î yê Ferhengê TDK de 43186 çekuyan ra 13244 (% 30.6) çekuyê girewteyî tirkî de mendê. Enê çekuyan ra 6914 hebî fransîzkî (% 16), 3174 hebî erebkî (% 7.3), 1859 hebî fariskî (% 4.3), êyê bînî zî ziwananê muxtelîfan ra yê.<sup>11</sup>

Tirkan çekuyan ser o tek bi tek vindertişî ra vêşêr bi hawayê sîstematîk çekuyê xwu tesnîf kerdê. Mesela, verê verkan sey "çekuyê safî tirkî" û "çekuyê ke kokê xwu xerîb" tîmîyan ra vetê. Çekuyê ke ziwananê xerîban ra dekwetê tirkî zî, di grûban ser o tesnîf kerdê:

1-Çekuyê xerîbî (yabancı sözcükler)

2-Çekuyê girewteyî (alıntı sözcükler)

Çekuyê xerîbî (yabancı sözcükler), eke ziwananê ke alfabeya latînî şuxilnenê ra gêrîyayê, tirkan xwu rê kerdo qeyde, hem nuştîş hem wendiş de sey orîjînalê înan binusnê û biwanê. Mesela, çekuyê sey "**by-pass**", "**center**", "**check-ap**", "**flashback**", "**fuel-oil**", "**pizza**", "**show**", "**Washington**", "**Winston Churchill**" û sn. Kilmnuşteyan de zî eynî qeyde tetbîq kerdo. Mesela, "**BBC**" nusnenê û sey "bi-bi-si" wanenê, "**CNN**" nusnenê sey "si-en-en" wanenê, "**NTV**" nusnenê, sey "en-ti-vi" wanenê. Herfê ke enê hawa çekuyan de estê, eke alfabeya tirkî de çin bê zî, ancî nusnenê.

Meselaya "çekuyanê girewteyan" bineyke komplîke ya. Çimkî tarîxê ke nîno zanayîş ra nat, sey her mîletî, tirkan zî îhtîyacê xwu gore, bi hawayêko tebîî, zaf ziwanan ra çekuyî girewtê û seke malê ziwanê înan bê, winî heyatê rojane de, hem vatişkî hem nuşteki bikar ardê.

<sup>10</sup> Prf. Dr. Hayati Develi, Osmanlı Türkçesi Kılavuzu - I, Kesit Yayınları, İstanbul, 2009, r. 11

<sup>11</sup> Osman Yıldız, Dilimizdeki Arapça ve Farsça Kökenli Kelimelerde Görülen Fonetik Değişmeler, SDÜ Fen-Edebiyat Fakültesi, Sosyal Bilimler Dergisi, Yıl: 1999, Sayı: 4. r. 322-323



Xebata standardîzekerdişi de tirkan enê hawa çekuyî, yanî "çekuyê girewteyî" (alıntı sözcükler) sey çekuyê tirkî hesibnayê, înan ra vato "çekuyê tirkî yê kokê xwu xerîb" (yabancı kökenli Türkçe sözcükler) û seke çekuyê tirkî bê, verînanê înan senî telafuz kerdê, înan zî hema vajêne ke bi eynî şekl kod kerdê. Ma vajin, verênanê înan wext û zemanan de çekuya "barkîr" fariskî ra girewta û sey "beygir" telafuz kerda, ancî çekuya "câmeşûy" sey "çamaşır", "çepûrast" sey "çapraz" telafuz kerda, înan zî bi eynî şekl kod kerdê. Çekuyê erebkî zî bi eynî hawa, mesela, çekuya "axur" sey "ahır", "ğirbal" sey "kalbur", "manqal" sey "mangal", "tewbe" sey "tövbe", "sahrînc" sey "sarnıç" telafuz kerdê û nuştê.<sup>12</sup> Çekuyanê fransizkî de zî wina kerdo, ma vajin, "dossier" û "station" sey telafuzê xwu, yanî sey "dosya" û "istasyon"<sup>13</sup> telafuz kerdê û bi eynî şekl standardîze kerdê.<sup>14</sup> Yanî xebata standardkerdişi de înan hîna zaf formê ke şar telafuz keno (halklaşmış form) esas girewto.

Tirkî de, hetê fonolojî ra yew qeyde esto ke sey nasnameyê tirkî yo, ci ra vanê "pêkerdişê venginan" (ünlü uyumu). Çekuyê ke ziwananê xerîban ra dekwetê tirkî yan zî ma vajin tirkan ziwananê xerîban ra girewtê, înan qeydeyê "pêkerdişê venginan" (ünlü uyumu) enê tewir çekuyan ser o tam tetbîq nêkerdo. Yanî çekuyê ke verêna şarî prosesê tarîxî de eke bi hawayêko tebîî qeydeyê "pêkerdişê venginan" (ünlü uyumu) gore telafuz kerdê, înan zî wina standardîze kerdê, êyê ke nêbîyê, sey xwu verdayê. Mesela, erebkî de yew qeyde esto. Herfê "خ, غ, ظ, ط, ض, ص" sey herfê qalindî hesab benê. Qeydeyê erebkî gore, enê herfan dima eke ziber (fethe) bêro, yanî "e" bêro, sey "æ" telafuz beno. Mesela, erebî "خَبْر" (xeber) nusnenê la sey "xæber" wanenê, "قَلَم" (qelem) nusnenê la sey "qælem" telafuz kenê.

Tirkan dewro klasîk de xwu rê kerdo qeydeyêko sabît, çekuyê erebkî û fariskî eynî sey orjînalê ci nuştê, tayê îstîsnayî estê la exlebê xwu sey eslê ci zî telafuz kerdê. Mesela, înan vengê "æ" sey "a" telafuz kerdo. La înan eno qeyde bineyke mubalexe kerdo, herfê "ح, ع" zî qîyasê enê qeydeyî kerdê, mesela, "حميد" (Hemîd) sey "Hamit", "علي" (Elî) sey "Ali" telafuz kerdo. Ancî herfê "ر, ل" ke hem qalind hem tenik wanîyenê de tayê cayan de herfa "ر" zî qîyasê enê qaydeyî kerda, ma vajin ke, "رَحْمَان" (rehman) sey "rahman" telafuz kerdo û demeyê standardîzekerdişi de eno qeydeyo ke êdî tirkî de tam ronîştö, alfabeya latînkî de zî tetbîq kerdo.<sup>15</sup>

Seke ma va, tirkan hetê formî ra yewbînan ra cîya-cîya tercihkêrdişê çekuyan ra vêşêr, qeydeyan ser o xebata standardkerdişi aver berda. Mesela, badê ke alfabeya latîni adapteyê tirkî kerda, çekuyê ke kokê xwu erebkî û fariskî yo, halo sade de vengê "b, c, d, g" yê peynîya çekuyan bi "p, ç, t, k" vurnayê. Labelê enê hawa çekuyî eke ziwananê ke alfabeya latîni şuxilnenê ra yenê, tam tetbîq nêkerdo. Mesela, çekuya "reng"î fariskî ra girewta, nuştîşê latînkî de sey "renk" standardîze kerda la çekuyê sey "psikolog" ke ziwananê Ewropa ra yenê de herfa "g" nêbedilnaya.

<sup>12</sup> Osman Yıldız, Dilimizdeki Arapça ve Farsça Kökenli Kelimelerde Görülen Fonetik Değişmeler, SDÜ Fen-Edebiyat Fakültesi, Sosyal Bilimler Dergisi, Yıl: 1999, Sayı: 4, r. 334

<sup>13</sup> Osmanlı Türkçesine Giriş - I, Anadolu Üniversitesi Yayını, Eskişehir, 2017, r. 82

<sup>14</sup> Doç. Dr. Hülya Pılandı, Türkçe Ses Bilgisi, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2017, r. 130-131

<sup>15</sup> Seba îzehkerdişê enê qeydeyî seyda Hemîd Ozanî rê zaf sipas.

Xulase, eke merdim bi kilmîye vajo, tirkan standardkerdişê çekuyan neke bi hawayê reydayişî tek bi tek sey formo standard qebûl kerdê, ê qeydeyan ser o şuxilîyayê û sîstem saz kerdo.

Helbet tirkan mîyanê şarî ra zî çekuyî arêdayê, enê hawa çekuyan de qaydeyê nuştîşî gore form raşt kerdo, la tirkî esas ziwane xwu yê nuşteki ser o xebitîyayê, yanî bala xwu dayo ser ke nuştöxanê înan çekuyî bi kancîn form nuştê û senî şuxilnayê, înan zî o gore kod kerdê.

Tirkan xebata xwu ya ziwani pêro bi tirkî kerda; şinasnayişê sîstem û qeydeyanê ziwani ra bigêrê, tesbîtkerdişê awaniya çekuyan û tesnîfkerdişê înan, tesbîtkerdişê vengyan ra bigêrê heta bi telafuzkerdiş, îzehetê qeydeyanê gramerî û îmla ra bigêrê heta bi amadekerdişê ferhengyan, heme xebata xwu bi ziwane xwu kerda. Esasê xwu de merdim vajo xebata standardkerdişê tirkî sey îslehetî dewam kerda, hîna raşt beno. Zemanê Atatürkî de, bi amancê safkerdişî, viraştîşê çekuyanê neweyan de kewtê tengane, seba ke ziwaneke newe ameyo meydan tey asê biyê. La dima, vera vera xebata xwu sererast kerda. Çekuyê ke newe viraştê, bi îmkananê dewlete, warê resmî de pratîze kerdê. Labelê nuştöxan û edîban ser o, ancî weşanê ke resmî niyê ser o ferz nêkerdo ke îllahîm gereka riayetê qeraranê dezgeyê ziwani bikerê.

## **Kirdkî de Xebata Ziwani**

Kesê ke ziwani ser o xebitîyenê, gereka ferq de bê ke xebata ziwani zaf teferuatin, zaf narîn, zaf nazik, zaf hesas a. Gereka xwu vîr ra nêkerê, destkarîyêka qıcaleke de zî potansiyelê xeripnayişê kozmolojîyê ziwani esto. Ma vajin, yew doktor wexto ke emelîyatêk keno, eke bi xeletî zerar bido yew damara barîçeke beno ke heta bi heta nêweşî seqet bikero. Ziwani zî eynî winî yo, yanî yew xeletîya qıceke bîle eşkena sîstemêkê ziwani seqet bikero.

Gereka merdim ziwani sey hereketê sîyasî yan fraksîyon nêvîno û çekuyan zî seke nefer bê nêkero zereyê unîforma û esla xwu zî sey otorîte<sup>16</sup> nêvîno. Gereka her kes zaf hesas têwbigeyro ke rayir nêdîyo întîbayêka winasî. Çimkî ziwani mîrasê hezaran serran o ke ameyo resayo ma û milkê neslanê ma ra dimayî yo. Mesela, qerarê ke gêriyayê esla sey mutleq/muqedes nişan nêdîyê û bi tehekum (baskı) nêrê ferzkerdiş. Gereka heme pêşniyaz û qerarî<sup>17</sup> şefaf û revîzekerdişî rê tim akerde bê.

Heto bîn ra, kesê ke teber ra ewnîyenê xebata ziwani ra zî, raşt niyo ke tenya bi hîsanê muxalifiye û dişminane her çî red bikere. Çimkî merdim eşkeno bi kerdişê xeletîyan zî bireso netîceyo raşt. Coka

---

<sup>16</sup> Xebata ziwani de gereka merdim esla çekuya "otorîte" nêşuxilno, çimkî otorîte (fr. autorité) manaya "sulta" de yo, yanî "emir kerdiş, dayiş kerdiş, qedexe kerdiş, dayiş îtaetkerdiş" o. Xebata ziwani de termê "ziwannas" maqul o; yanî ziwani ser o xebitîyayo, derheqê ziwani de heta dereceyêk biyo wayirê malûmatî.

<sup>17</sup> Xebata ziwani de sey mekanîzma bikarardişê "qerar"î xelet o. Mîsalen, 15 kesî ronîştê, nîmeyê înan kirdkî de yew cumle nênuştê, labelê rey danê ke formê "munzur" yan "mizur" standard bo. 6 kesî bêteref manenê, 4 kesî rey danê "munzur"î, 5 kesî rey danê "mizur"î, bi eno qeyde "qerar"î gêriyeno. Coka xebata ziwani de metodê "qerar"î îlmî niyo, raşt zî niyo. Xebata standardkerdişî de gereka sîstemê ziwani ser o krîterî verê cû bi hawayêko zelal dîyar bibê, tesbît bibê û çekuyî enê krîteran gore munaqeşe bibê, êdî kancîn form munasib o, bê "rey" dayiş yan "qerar" girewtiş bi xwu vejîyeno meydan.

her hawa xebate ra vêşêr gereka xebata ziwani de merdim mentiqî bo; îlmî û lojîkal bixebitîyo û bi enê krîteran analîz bikero.

Ancî, kesê ke dîrekt beşdarê girewtişê qeraran nêbenê, la sey endam/wendox/nuştox bi hawayêk dorê xebata ziwani de ye, ganî esla sey sempatîzan bi hisanê terefdarîye xebate, neşrîyat û qerargirewtohan teqdîs nêkerê yan zî xebatanê bînan negatîfîze nêkerê çimkî ziwani îdeolojî yan dîn nîyo. Kesê ke ziwani ser o xebitîyenê zî elleme nîyê, pêxember qet nîyê. Zaf mumkin o ke sedemanê cîya-cîyayan ra xeletî bikerê.

Xebata standardîzekerdişê kirdkî (kirmanckî, zazakî, dimilkî) 1996 de hetê 15 eleqedaran<sup>18</sup> ra bi ronayîşê "Grûba Xebate ya Vateyî" dest pêkerd. Grûbe reya verîne 2-4.08.1996 Swêd de kom bîye, kombiyayîşê 30. zî rojanê 28-31.07.2017 de Duhok de kerd. Endamê grûbe tim vurîyayî, hetanî nika hûmara sîrkulasyonî 50 kesî ra vîyarta. Qismêko muhîm Grûbe ra aqîtiyayê, kesê ke destpêk ra Grûbe de mendê 5 kes ê. Grûbe bi şeklê têvernayîşê çekuyan/terman, bi amadekerdişê "ferhengê tirkî-kirmanckî (zazakî)" çekuyan formê standard de kod kena. Sey mehsûlê diyin ye xebate zî "ferhengê kirmanckî (zazakî)-tirkî" amade kena. Hetanî nika ferhengê tirkî de des hezarî ra vêşêr çekuyî û termî formê standard de ameyê kodkerdiş.

Derheqê xebata Grûbe de bi şeklê daşinasnayîş, behskerdiş, enformasyon yan zî teqdîrkerdişî nuşteyî, ancî fihrist û îstatîstîkî neşir bîyê, konferansan de ameyê wendiş. Nuşteyê mubalexeyî ye sey "pesindayîş", "wesifnayîş" û "teqdîskerdiş"î ke neşir bîyê zî tay nîyê. Feqet derheqê usûl û metodê xebate de, ancî derheqê çeku û termê ke sey standard qebûl bîyê de tu erjnayîş, krîtîk yan zî munaqese nêbîyo.

Zaf sedemê nêbîyayîşê krîtîkî estê la ci ra yew eno yo ke, xebate dereceyê "tabu" de teqdîs bena. Seba ke xebate bi hawayê îdealîstane bena, coka "teqdîs"î rê akerde ya, hetanî dereceyêk zî heq kena. Labelê gereka merdim vajo, seba întîbayêka winasî fealîyetêko organîze zî esto û yew îdrak (algî) ameyo viraştîş. Ma vajin, nuştoxêk vano: "*Vateyî; nuştoxî, wendoxî, şairî, akademîsyenî, doktorî, avukatî resnayê*."<sup>19</sup> Helbet xebata Grûbe dir zaf kesan dest bi nuştoxîye kerd, epey nuştoxî, wendoxî, şairî resayî, ancî gelêk edebîyat ame meydan. (Eno çî, dinya de seba heme weşanan winî yo.) Bi kilmîye, xebata Grûbe û kovara *Vateyî* seba averşîyayîşê kirdkî sînerjîyêko muhteşem ard meydan. Gereka eno cad û xeyret bêro teqdîrkerdiş, hurmet nîşan bidîyo. Labelê îfadeyê "... *akademîsyenî, doktorî, avukatî resnayê*" yewna çî yo!

Fikro ke muhtewaya nuşteyî de yo helbet nuştoxî eleqedar keno la kesê ke kovare vejenê zî eynî derece de, heta hîna zaf mesûl ê. Mesela, eger nuştoxî nuşteyê xwu de îfadeyêkê sey "*Vateyî; nuştoxî,*

---

<sup>18</sup> Mîyanê enê 15 kesan ra çend kesê ke verê cû nuşto û heta dereceyêk kirdkî dir eleqedar bîyê estê labelê qismêko muhîm hetanî o wext wayirê tecrubeyê nuştîşî nîyê. Tayê metnan de seba ronayoxanê grûbe termê "roşînbîrê kurdan" zî ameyo bikarardiş la seba ke manaya termê "roşînbîr" zî tam ca de nîya coka mi termê "eleqedar" munasib dî.

<sup>19</sup> Vate, Kovara kulturî, Hûmare 50, r. 42

wendoxî, şairî... *nêresnayê*" binuştêne, êyê ke çapkerdişî ra ver nuştayan redakte kenê, wanenê, kontrol kenê derhal do mudaxele bikerdêne, bivatêne "*Ti raşt nêvanê! Vateyî; nuşttoxî, wendoxî, şairî resnayê. Îfadeyê xwu raşt bike!*" Eke nê, nuşte neşir nêbîyêne. Yan zî eynî hûmare de nuşttox ameyêne rexnekerdiş.

Yewna nuşttoxî zereyê nuştayê xwu de vato "*Eke ma kirdkî sey dînî bivînê, kitabo muqeddes yê nê dînî Vate yo. Xebatê bînî zî sey tefsîrê nê kitabî yê.*"<sup>20</sup> Êyê ke kovare vejenê, eno îfade mîyanê nuştayî ra veto kerdo sernuşte, kerdo spotê nuştayî (teqdîskerdiş zî teqdîs biyo). Xwura zêhnê wendoxan de îfade dewam keno: "*..., o ke kovare vejeno pêxember, kesê dorê ci de zî sehabeyê kîram ê.*" Çimkî *kitabo muqedeshetê* Homayî ra pêxemberî rê nazil biyo.

Yewna kesî, melumat û îstatîstîkê ke mi yew roportaj de derheqê *Newepelî* de dayê, seba ke negatîfîze bikero, yan zî seba ke dekero binê hukmê *kitabê muqedesî* wina nušto: "*... ma kesê ke ewro nusenê, ma heme 'Palto'yê kovara Vateyî ra vejîyayê.*"<sup>21</sup> Palto? O kes neke palto<sup>22</sup> belkî "cêb"ê paltoyî ra vejîyayo, ez nêzana. Labelê qet raşt nîyo ke "*ma kesê ke ewro nusenê*" paltoyê *Vateyî* ra vejîyayê. Mesela, îsbatkerde yo ke tayê kesan vejîyayîşê kovara *Tîrêjî* ra di serrî verê cû *Roja Welat* (15.09.1977) de nušto. Ez şexsê xwu ser vajî, ronîyayîşê Grûbe û vejîyayîşê kovara *Vateyî* ra zaf serrî verê cû mi nuştêne. Reya verîne, hamnanê 1991 de, mi di nuştayê kirdkî kovara *Deng* rê şirawitî, yew weşanîya la ez nêşkaya ê bînî tesbît bikerî. Dima, biewnîyêne rojnameyê *Ûlkede Gündem* (30.06.1992) qismê yadkerdişê şehîdan ra (şîrî), ancî *Azadîya Welat* (21.02.1996), kovarê sey *Nûbihar*, *Jîyana Rewşen*, *Nûdem* û hema gelêk kovarê ke nameyê înan nika nîno mi vîr. Verî ke *Vate* bivejîyo bi desan tewir nuştayê min ê kirdkî enê rojnameyan û kovaran de weşanîyaybî. Pêro îsbatkerde yê. Labelê gereka merdim heqe vajo, prosesê *Vateyî* de ma nuştîşê formê çekuyan de, îmla de zaf aver şîyî. Çimkî kovara *Vateyî* dir zîwanê ma kewt prosesê kemilîyayîşî ser ke enê de keda bi desan merdiman esta. Mi bi xwu kitabane xwu de, nuştayanê xwu de tim "sipasî" kerda, heta kesê ke tenya "yew cumle"ya mi bîle raşt kerda, ancî zî mi nameyê ci bi hurmet destpêkê kitabê xwu de yad kerdo nušto û ez esla kede rê hurmet de qusûr nêkena.

Enê tewir îfadeyê ke mi hîrê cumleyî ci ra neqil kerdî xwu rê bi xwu nêvejîyayê meydan, eserê zêhnîyetêk ê. Eynî sey manîpulyasyonêkê polîtîkî netîceyê nawitîşê yew întîba de zuhûr kenê. Senî ke padişayî bi xwu kesî ra nêvatbi bêrê mi ra vajê "*Padişahım çok yaşa!*" la insanan de wina yew îdrak/zêhnîyet dabi viraştîş, eynî o qeyde. Behsê îstatîstîkanê 100 hûmaranê yew rojnameyî kerdiş esla "*...pasmê xo dayo û pasmê xizmetê xo dayo*" nîyo. Ma zor bidin ci, yanî bi îftîra ma bikin "pesn" zî, ancî hezaran qat insanan de pêardîşê zêhnîyetêkê winasî ra masumêr û bêguneyêr o.

<sup>20</sup> Vate, Kovara kulturî, Hûmare 50, r. 49-50

<sup>21</sup> <http://dersiminfo.com/xizmete-ziwani-xizmete-insaniyeti-yo>

<sup>22</sup> Zaf eşkera yo ke kovare palto nêdana xwu ra, ancax kesî palto bidê xwu ra û xwura tîya de zî bi hawayê îstîfare (eğretileme/dolaylama) ameyo bikarardiş. Îmajê "palto"yî hikayeya Gogolî "Palto" îşaret kena. Hikayeya Palto edebîyatê rûsan de destpêkê hikayenuşttoxîya moderne qebûl bena, coka rûsan vato "Hikayenuşttoxîya ma 'Palto'yê Gogolî ra dest pêkerd." Eno fikir, neke bi çekuya "palto"yî la bi yewna tewir, verê cû nuştayê editörî yê yew hûmara kovara *Vateyî* de zî îfade bibi.

Ez nika wexto ke derheqê xebata ziwani de enê çiyana vana (ez fikirîyayîşê nuşteki raşt vîna u hes kena fikrê xwu beyan bikerî), motîvasyonê mi esla cewabdayîşê tayê fikiranê neheq, xelet u bêfaydeyan nîyo. La heqê tu kesî zî çinê yo ke bi fealîyetanê manîpulatîfan kesî yan xebata ci bêqîmet bikero. Seba ke ma yewî teqdîs bikin, gereka îllahîm ma pay bigeyrin yewnayî ser? Seba ke ma kesêk xwu rê bikin "îdol", îlahîm gereka ma bi xayîntî yewnayî pey ra kardî bikin? Gereka ma tovê dişmintî biramin, jehr bikerin mîyanê xebata xwu ya masum u pîroze?

Seba ke enê tewir fikirî zerar danê xebata ma ya ziwani, nêverdenê fikrê çiyayî u analîzê îlmî bivejîyê meydan, coka tenya mi hîrê cumleyî tîya neqil kerdî. Eke derdê merdimî polemîk yan munaqêşe bo, merdim eşkeno perde baş hewano u behsê bi seyan çiyane sabî/konkretan bikero! Labelê ez hes kena her kes mesûlîyet u hedê xwu bizano, çiyê ke ziwani, kultur u medenîyetê ma rê feydeyê xwu esto vajo u binusno, xebatê ke feyde danê ziwane ma bikero, fikrê ke feyz danê binusno.

Ziwani dîn nîyo, teşbîhê ci bile xelet o. U eke ma xebata ziwani de selahîyet danê xwu, a game, heta ke mumkin o, gereka ma zerar nêdin çiyêk. Çi xebate bena wa bibo, wazenê wa yew cumle bo zî, ez vana, wa feydeyê xwu tay bo la wa zerarê xwu çinê bo; gereka merdim xesarat nêdo ziwani, kultur, medenîyet u qederê miletê xwu ro.

Kam beno wa bibo, qic-pîl, wendox-nuştox, ferq nêkeno, gama ke merdim derheqê xebata ziwani de yan zî kedkaranê ziwani de qîsey keno, gereka zaf bi dîqet qîsey bikero. Mesela, gereka fealîyetanê binkî u xirabkerdişî ra xwu hemet bikero, naşînan fit nêkero. Eke nusneno, gereka hezar rey bifikirîyo hema qala xwu vajo.

Badê enê îzehetî, însalah ez do bala xwu bidî xebata ma ya standardkerdişê çekuyan ser. Tayê notê ke mi girewtê, firsendê mi bibo, ez do neşîr bikerî. Çimki ez vana gereka êdî ma ageyirin biewnîn pirêzeyê xwu ra, ma bieşkin xebata xwu krîtîk zî bikin. Bi eno qeyde însalah do bergeyê ma hîna hîra u roş bo, xebata ma zî bi îstîqrar dewam bikero.

## **Xebata Ziwani u Trawma**

Xebata ziwani heme ziwani de zaf hesasîyet wazena la ziwane miletanê bindestan rê hîna zaf hesasîyet lazim o. Ziwane miletanê bêdewletan ser o şuxilîyayîş, standardîzekerdişê ziwaneke apeymendeyî zaf zehmet o, esas xebatêka zaf rîskin a.

Seba ke metnê ma yê nuşteki zaf tay bî coka ma de xebata standardîzekerdişî "ziwane vatişki" ser o bîye. Eno semed ra pêro çekuyî nêdîyayî arê, tamamê formê çekuyan tesbî nêbî. Her çekuye de, qaso ke eşkayê bidê arê, tercihkardiş înan mîyan de bi.

Eger ma ecele nêkerdêne, ma kovar u rojnameyî bivetêne, fekê mintiqayan tam bivejîyayêne meydan, ziwane ma yê nuşteki baş aver bişîyêne, kulturê ma yê nuştişî ronîştêne, ma awani u sîstemê ziwane

xwu baş bişinasnayêne, repertuarê çekuyanê ma tam bivejîyayêne meydan, ma vengî û çekuyê xwu tesnîf bikerdêne, o wext ziwanê ma yê nuşteki de zafê formê çekuyan xwuvero şekil girewtêne.

Seba ke ma bi ziwanê xwu perwerde nêbîyê, ziwanê ma binê qedexê û tehqîrî de yo, kolonyalîstan bi darê zorî ziwanê xwu ma ser o ferz kerdo lewma çerxê fikirîyayîşê ma birîndar o, seqet o. Ma ne eşkenê xwu ziwanê xwu de baş îfade bikerin ne zî ziwanê serdestî de. Însanê ma bikarardîşê her di îmkanan ra zî bêpar mendê. Ena rey, xebata standardkerdîşî dir "ziwano standard" vejîya ma ver. Hişê însananê ma de "ziwano standard" prestîjin, "ziwanê mintîqa" yan zî ma vajin "fekê dewa ma" seke bi şalwalan û fîstan dewij bo, winî yew îmaj ame meydan. Coka nuştoxan de kompleksê xwukêmdîyayîşî virazîya; bi ziwanê dewa xwu nuştîş de, qiseykerdîş de bîle, tereddud de mendî. Mesela, kelîmeyê ke ma cuya xwu ya rojane de pê qisey kerdêne, seke zafê înan xelet bê. Ez xwu ser vajî; ma vatêne "Çêrmûg (n)" mi ewnîya ke bîyo "Çêrmûge (m)", ma vatêne "Hêne (n)" mi dî ke bîyo "Hêni(n)". Ma vatêne "Sêwreke (m)", mi ewnîya ke bîya "Sêwregî (m)". Ma het "mektebe" makî ya, mi ewnîya ke bîya "mekteb (n)", "mektûb (n)" biyo mektube (m), "kaxid (n)", biyo "kaxite (m)", "zerf (n)" bîyo "zerfe (m)... Ancî ma vanê "xwu", "gwunî", "barûd", "qisûr", "usûl", mi ewnîya ke bîyê "xo", "gonî", "barut", "qusur", "ûsul"...

Bi eno qeyde, bi seyan çekuyan de nêrkî-makîti û formî hişê mi de kewtî têmîyan.<sup>23</sup>

Seba ke mi mekteb nêwendo coka trawmaya ke perwerdeyê tirkî ra yena meydan mi de hende çinê bî. Heto bîn ra, heyatê xwu yê rojane de zî mi ziwanê tirkî red kerd, coka nîsbet bi nuştoxanê ma yê bînan, birîna ziwani mi de hende xorîn nêbî. Labelê bi eno qeyde "ziwanê standardî" çerxê sîstemê fikirîyayîşê mi de bîle trawma viraşte. Eynî sey serranê 1930an yê zemanê Atatürkî, bingeyê trawma de tesîrê tezyîqê sert yê ferzkerdîşê "qerar"an zî tay nêbi.

---

<sup>23</sup> Fikrê "ziwanê standardî" ra ver, wexto ke mi şîr yan hîkaye nuştêne, binhişê mi xwuvero herikîyayêne la badê ke mi xwu ser o tehekumê "ziwanê standardî" hîs kerd, herikîyayîşê binhişê mi gîna sekte ro, eynî seke ez bi yewna ziwani binusnî, o qeyde ez tey menda. Nuştîşê her kelîme de mi ewnîyayêna ferheng ra gelo uca de makî yan nêrkî qeyd bîya, formê xwu çî yo. Ena rewşe mi de epey wext dewam kerde. Seba ke mi xwu şidênayêne melekeyê min ê hunerî şikîyayî, qabilîyetê min ê afernayîşî xesar dî. Netîce, edebîyat bi ziwani beno û şertê tewr verîn yê fealîyetê afernayîşê hunerî azadîya bêsinor û huzûrê şîûrî/binhişî yo.

Enê hetî ra eke merdim bala xwu bido sewbîna nuştoxan ser netîceyêko balkêş vejîyeno meydan. Mesela, ma hunerê romanî bidin yew kîşte, kitabânê Deniz Gunduzî "Kilama Pepûgî" û "Kalaşnikof"î hetê bikarardîşê ziwani ra muqayese bikerin, baş beno. Eke tede xeletîyê îmla û formê ziwanê vatişkî-ziwanê nuşteki bibê zî ziwanê "Kilama Pepûgî" tebî û xas o, hetê sentaks-semantîkî ra cumleyî raşt ê. La ziwanê "Kalaşnikof"î hem viraşte hem zî pîrrî xeletîyê sentaks-semantîkî yê. Ziwanê "Soro"yî mabeynê her diyan de ca gêno. Nuştox herinda ke prosesê xebata standardîzekerdîşî dir şuxilnayîşê ziwani de aver şiro, apey şîyo. Nuştoxanê ma yê bînan ke verê cû hikayeyî nuştî, balkêş o ke prosesê xebata standardîzekerdîşî de êdî edebîyatê nesrî de eserî nêafernayî.

Badê ke mi xwu binê tazyîqê bikarardîşê formê standardî ra vet û ez eşkaya bi zanayîş, yanî bi îradeyê xwu yê azadî formê ke raşt kod bîyê ferq bikerî û qebûl bikerî, xwu mecbûrê rîayetkerdîşê heme forman nêvînî, ez ameya xwu. Xwura prosesê *Newepelî* de mi nuştoxî tembîh kerdêne ke bi fekê mintîqaya xwu binusnê. Hesasîyetê mi formê çekuyan ra vêşêr sîstemê ziwani ser o yo. Tenya mi dîqet kerdêne ke nuştoxê ma fekê mintîqaya xwu gore cumle raşt saz bikerê. Eke cumle raşt saz bibo famkerdîşê fekê mintîqayan de qet problem nêmaneno. Bi eno qeyde fekê mintîqayan epey vejîyayî meydan, mesela, fekê Çewlîgî, fekê Şankuşî, fekê Sêwreke û fekê sewbîna cayan de metnê muhîmî *Newepel* de neşir bîyî.

Tesîrê fîlan yê çekuyan ra zêdeyêr o. Mesela, ma het vanê "ez **bena**, ez **derzena**, ez **kena**, ez **şuwena**, ez **wena**..." Eke kar prefîksê "**bi-/nê-**" bigêro wina beno: "Ez **biberî**, ez **biderzî**, ez **bikerî**, ez **bişuwî**, ez **biwerî**..." Mıntıqaya Pîranî de, tayê cayan de, vanê: "Ez **bibera**, ez **biderza**, ez **bika**, ez **bişuwa**, ez **biwera**..."

Seba ke kirdkî ser o xebate zaf tay bîya coka zafê qeydeyan tesbît nêbîyê, ancî fekê mintiqayan muqayese û analîz nêbîyê. Heto bîn ra, xwura ma de meselaya karan zaf komplîke ya. Labelê tenya bi fetwaya makîtiya zemîrê "ez (m)" qeydeyê Pîranî nuştoxan ser o dîkte beno. Nuştoxan seba ke *Vate* de dîyo yan zî nuşteyê ci de mudaxele biyo, ti ewnîyenê Gimgim, Çewlîg yan Dêrsim ra yê, la ha vanê "ez **bika/nêka**..." Oxro ke eno qeyde bi "makî" biyayişê zemîrê "ez"î îzeh nêbeno. Eke semedê mintiqaya Pîranî wina bo zî, sîstemê mintiqayanê bînan de winî nîyo.

Heto bîn ra, eno hawa mudaxele hem kapasîte û îmkananê zıwanî keno teng hem sîstemê zıwanî xeripneno hem zî nuştoxan de beno sedemê trawmaya fikirîyayîşî. Çimkî gama ke nusnenê, seke mi cor de qal kerd, êdî rehet nîyê, tesîrê destkarîye sîrayetê binhişê înan kerdo. Muhtemelen xwu rê vanê, herhal yê ma xelet, yê înan raşt o.

Redaktekerdiş de neke formê çekuyan û karan tenya hetê sentaks û semantîkî ra nuşteyî teshîh bibîyêne, do nuştoxîya ma hîna tendurist aver bişîyêne. Mesela, ez tenya yew cumle sey nimûne nîşan bidî ke meramê mi fam bibo:

*“Roşanî, cuya şaran de zaf cayêko giran tepşenê.”*<sup>24</sup>

Hetê gramerî û formê çekuyan ra cumle de problemêk nêaseno la xeletîyê sentaks-semantîkî tede estê:

- 1) Eke cumle de îfadeyê cîyayî çinê bê, sey tirkî zıwanê ma de vîrgul (,) nêkeweno mabeynê kerdox û karî.
- 2) Sifetê “zaf”î aîdê “ca”yî nîyo, aîdê “giran”î yo (... cayêko **zaf giran**).
- 3) Çekuya “tepiştîş” û “girewtîş” eynî mana de nîyê. Tepîştîş, hîna zaf seba çîyê muşexesî ke merdim pê gêno (yakalamak/tutmak) şuxilnîyeno.
- 4) Ê “ca” giran-şenik nêbeno.

Gereka cumle wina teshîh bibîyêne: *“Roşanî cuya şaran de cayêko zaf muhîm gênê.”*

Eno terzê redaktekerdişî nuştoxan de fikirîyayîşê bi eqlê kirdkî zelal keno, fikirîyayîşê bi zıwanê dayike dano ronîştîş. Labelê verî ke merdim bibo wayirê tecrubeyê nuştoxîye, formê çekuyan û karan ke nuştox înan rê xerîb o, ser o dîkte bibe, binhişê ci de tesîrêko negatîf pêyeno. Bala nuştoxanê xeşîman şuxilnayîşê çekuyan û terman ra vêşêr şina formî ser.

---

<sup>24</sup> Vate, Kovara kulturî, Hûmare 43, r. 9 (Cumleya tewr verîn yê nuşteyî ya û nuşte hetê hîrê kesan ra redakte biyo.)

Semedo ke mi şokbîyayış yan zî trawmaya derheqê "standardkerdiş"ê çekuyan û terman xwu de ferq kerde coka prosesê *Newepelî* de mi cumleyê nuştoxan sey nimûneyo ke mi nîşan da, o qeyde redakte kerdî. Çekuyî zî, tenya mi hetê ferqê ziwanê vatişkî-ziwanê nuşteki ra teshîh kerdî.

Derheqê xebata ma ya ziwanî de yewna meselaya muhîme zî ena ya. Belkî sere de texmîn nêbîyo, la nika ma vînenê ke herinda "ferhengê kirdkî" de amadekerdişê "ferhengê tirkî-kirmanckî (zazakî)" tesîrêko negatîf xwu dir ard.

Esasê xwu de, tu mehzûrê amadekerdişê ferhengê kirdkî û sewbîna ziwanan çinê yo. Yanî vîst serrî verê cû zî nika zî, ma vajin, ferhengê kirdkî-înglîzkî, kirdkî-erebkî, kirdkî-fariskî û sn. amade bibîyêne baş bi. La bi ê şertê ke hemîne ra ver "ferhengê kirdkî" bibîyêne. Yanî eke ferhengê îzehkerdişê manaya çekuyan û termanê kirdkî bibîyêne, amadekerdişê "ferhengê tirkî-kirmanckî (zazakî)" û "ferhengê kirmanckî (zazakî)-tirkî" de tu mehzûrêk çinê bi. Labelê semedo ke ma mecbûren bi tirkî perwerde benê û ziwanê tirkî ma ser o ziwanê resmî yo, coka herinda "ferhengê kirdkî" de îqamekerdişê "ferhengê tirkî-kirmanckî (zazakî)" hetê zanayîşê manaya çekuyan ra zerarêko cidî da mûsayîş û bikarardişê çekuyan. Mesela, kesê ke rewşa tebî de kirdkî zanê "dara valêre, dara mazêre, dara gozêre, dara tuyêre..." înan rê xelet nînenê. Labelê êyê ke tirkî ser ro kirdkî mûsenê, sey "söğüt ağacının ağacı, meşe ağacının ağacı, ceviz ağacının ağacı..." fam kenê.<sup>25</sup>

Ziwanan de ancax qasê se ra hîris-çewresê çekuyan motamot eynî mana de yê. Êyê bînî, hetê mana ra tenya nizdîyê yewbînan ê, tam muqabilê yewbînan de nîyê. Mesela, vera karê "**örmek**" yê tirkî de ma de çar karê çîyayî estê ke her yew tenya zî beno "örmek"ê tirkî, pêro têdir zî benê "örmek"ê tirkî:

**örmek: açînayene:** *kincan de yan zî qumaş de bi hawayê pêrabestişî yanî sey pînekerdişî bi lak û derzîni girewtişê qulikanê qijekan*

**örmek: mûndene:** *karê sey mûndişê gilaya porî, viraştîşê reseneyî û sn. ke dergankî ser mûnîyenê, yanî qaydeyêk gore derganki ser têro piştîş*

**örmek: riştene:** *1.bi destan yan dezge de mûyan, peşmî, peme û çîyanê bînan ra viraştîşê lakî 2.viraştîşê lepikan, pûncan, lûfik û sn.*

**örmek: vawitene:** *bi têro vîyarnayîşê lakan verinîye ser vawitişê çîyanê sey qumaş, palase, cacime, xalî, torre, qenevîç û sn.*

Eke ma neslanê xwu yê neweyan rê çekuyanê xwu bi eno qeyde yew bi yew îzeh nêkerin, ma tenya "ferhengê tirkî-kirmanckî (zazakî)" bidin înan ver, mumkin nîyo ke bieşkê ziwanê xwu tam bimûsê û raşt pê qîsey bikerê yan binusnê.

---

<sup>25</sup> <http://www.zazaki.net/haber/sogut-agacinin-agaci-altinda-2198.htm> (Derheqê problemê tirkî ser ro şinasnayîşê manaya çekuyanê kirdkî de bala xwu bide enê nuşteyî ser.)



## Standardkerdişê Kirdkî de Geleşe

Xebata ma ya zıwanî de qışmêk vengê ke vurîyenê tesbît bîyê û kodkerdişê formê çekuyan de bi îstîqrar tetbîq bîyê. Mesela, vengê "-an" bi "-ûn/-on/-û/-o" û vengê "-am" bi "-ûm/-om" de vengê "-an/-am" sey vengê eslî, êyê bînî vengê deforme qebûl bîyê û çekuyî enê krîterî gore ameyê kodkerdiş.<sup>26</sup> Labelê awanîya çekuyan ser o xebate nêbîya, çekuyê ma tesnîf nêbîyê. Mesela, çekuyê ke prosesê tarîxî de yan zî ma vajin xebata standardkerdişî ra ver kopya bîyê û zıwanê ma de ameyê şuxilnayiş ma înan senî kategorîze kenê û senî kod kenê, êyê ke ma newe kopya<sup>27</sup> kenê yan zî ma do bikin gereka senî kod bibê, zelal nîyo. Coka enê hetî ra geleşeyêko cidî esto. Mesela, xebata standardkerdişî de çekuyê ke zıwananê Ewropa ra kopya bîyê, qışmêk sey hawayê vatişê şarî kod bîyê. Ma vajin çekuyê sey:

**grup:** grûbe (m) [fr. groupe]

**kap:** qab (n) [fr. cape]

**pikap:** pîkabe (m) [îng. pick-up]

**teyp:** teyîbe (m) [îng. tape]

Seke aseno vengê "p" ke zıwanê orîjînalî de esto, sey telafuzê şarê ma biyo "b" labelê qışmêk çekuyan de vengê "p" ke zıwanê orîjînalî de esto muhafeze biyo:

**ekîp:** ekîpe (m) [fr. équipe]

**grip:** grîp (n) [fr. grippe]

**prensîp:** prensîp (n) [fr. principe]

Seba ke krîterî zelal nîyê yan zî prosesê xebate de bedilîyayê coka çekuyê ke eynî awanîye de yê her kombîyayiş de bi yew tewir ameyê kodkerdiş. Bi eno qayde kodkerdişê çekuyan sîstemê zıwanî de pênegirewtiş (tutarsızlık) ardo meydan.

Çekuyê ke xebata standardkerdişî ra ver, yanî prosesê tarîxî de dekewtê zıwanê ma, kodkerdiş de gereka telafuzê şarî esas bigêrîyo. Çimkî enê tewir çekuyî, eke kokê xwu xerîb bo zî êdî bîyê çekuyê ma. Zıwananê bînan de zî krîter winî yo. Labelê telafuzê şarî de muhtemel o ke formê cîyayî estbê. Înan mîyan de zî, ganî formo ke tewr nîzdîyê eslê ci esas bigêrîyo. Ma vajin, eslê çekuyê (sumerkî, arminkî) "munzur" o, la mîyanê şarê ma de tayê cayan de sey "mizur" zî yeno vatiş. Nînan ra formo ke

<sup>26</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî), Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005, r. 22

<sup>27</sup> Semedê çekuyanê ke yewna zıwan ra kewenê zıwanêk bikarardişê termê "girewtiş"î raşt nîyo, çimkî "girewtiş" de întîbaya seke emaneten gêrîyayê û do apey bidîyê esta, coka termê "kopya" hîna munasib o. Mesela, ma manaya "deyim"ê tirkî de çekuya "îdyom" înglîzkî ra kopya kerda. Ma ra teber sewbîna mîletan zî kopya kerda û zıwanê xwu de şuxilnenê la çekuya înglîzkî zıwanê xwu de mende ya, nêşîya cayêk. Înglîzkî de bi şeklê "idiom" nusîyena û sey "îdêyim" telafuz bena la ma bi herfanê alfabe ya xwu nusnenê û sey xwu telafuz kenê. Heme zıwanan de qayde bi eno tewir o. Heme mîletî çekuyê ke îhtîyacê înan pê esto la zıwanê înan de çînê yê, sewbîna zıwanan ra kopya kenê û sey xwu bikar anê. Yanî eke çekuyêka xerîbe daxilê zıwanêk biye gereka muameleyê çekuyanê ê zıwanî tey bibo, eynî seke aîdê ê zıwanî ya, o qayde bêro îstîhmalkerdîş.

nizdîyê eslê çekuye yo ganî sey standard bêro kodkerdiş. Coka bi metodê raydayîşî "standardîzasyon" raşt nîyo. Ma se merdimî dorê xwu de kom bikin, pêro bi yew veng ray bidê, vajê wa çekuya "*muzir*" standard bo, ancî xelet o.

Fariskî, erebkî, kurdkî û tirkî sey çar zıwanê cîranî kewtê têmîyan; farisan prosesê tarîxî de dinyayêk çekuyî erebkî ra kopya kerdê. Tirkan hem fariskî ra hem erebkî ra kopya kerdê. Ma vajin, tirkan çekuya "□□□□/*kaxiz*" fariskî ra girewta û sîstemê fonolojîyê xwu gore sey "*kağit*" kod kerda. Şarê ma zî vano "*kaxid* (n)", labelê ferhengê ma de bi hawayê "*kâğıt: kaxite* (m)" standardîze bîya. Seke aseno, çeku sey formê tirkî û makî qeyd bîya. Enê tewir çekuyan de gereka krîterê ma zıwano eslî bo neke zıwanê diyin. Çimkî çekuye zıwanê eslî ra dîrekt vîyarta kirdkî. Înanê ke mektebanê tirkan de wendo, binê tesîrê tirkî de sey "*kaxit*" telafuz bikerê zî şar vano "*kaxid*". Meselaya nêrkî-makîyê zî, ez dima ser o vindena.

Tayê mintiqayan de vengê "-e" yê peynîya çekuyan beno "-î", mesela, mintiqaya Pîranî de vanê: "*beyî* (m), *dawilî* (m), *Hênî* (n), *temmuzî*(m), *zeytunî* (m)". Tayê dewanê Pîranî de bi eno qayde vengê "û" zî beno "u/î". Mesela, sey "*hudud*, *huquq*, *qusir*, *ûsil*".<sup>28</sup> Ma vajin, eslê çekuyan sey "*huqûq*/حقوق" û "*hudûd*/حدود" o, awanîya înan eynî ya labelê ferhengê ma de bi hawayê cîya ameyê standardkerdiş. Zafê enê tewir çekuyan "*Zazaca-Türkçe Sözlük*" yê Malmîsanijî ra dîrekt neqil bîyê. Ez çend heban tîya nîşan bidî:

*barut: barut* (n) [eslê xwu de "*barûd*"]

*boncuk: mura* (m) [ma vanê "*mûra* (m)"]

*casus: casus*, -e [eslê xwu de "*casûs*"]

*husus: xusus* (n) [eslê xwu de "*xusûs*"]

*kabul: qebul* (n) [eslê xwu de "*qebûl*"]

*kekre: xunuq*, -e [ma vanê "*xinûq*"]

*keser: qedum* (n) [ma vanê "*qedûm* (n)"]

*ki: muye* (m) [ma vanê "*mûye* (m)"]

*kum: qum* (n) [ma vanê "*qûm*"]

*kusur: qusur* (n) [eslê xwu de "*qusûr*"]

*limon: leymune* (m) [ma vanê "*leymûne*"]

*macun: macun* (n) [eslê xwu de "*me'cûn*"]

*mağdur: mexdur*, -e [eslê xwu de "*mexdûr*"]

---

<sup>28</sup> Malmîsanij, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Deng Yayınları, İstanbul 1992

**mahsul:** *mehsul* (n) [eslê xwu de "mehsûl"]

**maymun:** *meymun*, -e [eslê xwu de "meymûn"]

**maznun:** *meznun*, -e [eslê xwu de "meznûn"]

**mebus:** *mebus*, -e [eslê xwu de "meb'ûs"]

**memnun:** *memnun*, -e [eslê xwu de "memnûn"]

**mezun:** *mezun*, -e [eslê xwu de "mezûn"]

**mısır:** *lazut* (n) [ma vanê "lazût (n)"]

**mum:** *mume* (m) [ma vanê "mûme (m)"]

**nüfus:** *nufus* (n) [eslê xwu de "nufûs"]

**öğrenme:** *musayîş* (n) [ma vanê "mûsayîş (n)"]

**poşu:** *puşî* (m) [ma vanê "pûşî (m)"]

**put:** *put* (n) [eslê xwu de "pût"]

**sabun:** *sabun* (n) [eslê xwu de "sabûn"]

**sınır:** *hudud* (n) [eslê xwu de "hudûd"]

**suç:** *suc* (n) [eslê xwu de "sûç"]

**surat:** *surat* (n) [eslê xwu de "sûret"]

**sütun:** *estune* (m) [ma vanê "estûne (m)"]

**süzgeç:** *parzun* (n) [ma vanê "parzûn"]

**şurup:** *şurub* (n) [eslê xwu de "şurûb"]

**tapıncak:** *put* (n) [eslê xwu de "pût"]

**temmuz:** *temmuze* (m) [eslê xwu de "temmûz"]

**usul:** *ûsul* (n) [eslê xwu de "usûl"]

**vücut:** *wucud* (n) [eslê xwu de "wucûd"]

**yalan:** *zure* (m) [ma vanê "zûr (n)"]

**zeytin:** *zeytune* (m) [eslê xwu de "zeytûn"]

Tîya de problem "*dewa ma*" yan "*dewa şima*" yan zî "*mi sereyê xwu ser o dejnayo*" nîyo, eke ma seba standardkerdişê ziwaniê selahîyet dayo xwu û mîsyon girewto, o wext ganî ma bala xwu bidin bitûniya ziwaniê ser. Mesela, eger ma çekuya "حقوق" sey "huqûq" la çekuya "حدود" sey "hudud" kod bikerin, sîstemê ziwaniê de pênegirewtiş yeno meydan, gelemşe virazîyeno.

Esasê xwu de çekuyê sey "hudûd, huqûq, nufûs, qusûr, şurûb, wucûd, xusûs..." de yewna xisûsiyet zî eno yo ke, vengê "u"yo verîn, eynî seke çekuyanê sey "dunya", "zulm/ظلم" û sn. de beno, enê çekuyan de zî beno "i", yanî kurdan de sey "hidûd, hiqûq, nifûs, qisûr, şirûb, wicûd, xisûs..." telafuz benê. Ma de bi eno qayde telefuz benê.

Labelê seba ke xebata standardkerdişî de krîterî dîyar nîyê û seba ke xebate bi hawayê amadekerdişê "ferhengê tirkî-kirmanckî (zazakî)" dewam kena coka her kombîyayîş de yew tema gore çekuyê tirkî têbin de rêz benê û muqabil de kancîn çekuyê kirdkî arêdfiyayê, înan ra yewe yena tercihkardiş. Motîvasyon hîna zaf hetê mana ra muqabilê yewbînan de (tirkî-kirmanckî) amadekerdişê ferhengî yo. Labelê semedo ke îmajê "standard"î zî teşmîl bîyo coka enê çekuyî sey "formo standard" yenê ferzkerdiş. Eke xebata standardîzekerdişî bi hawayê amadekerdişê "ferhengê kirdkî" bibîyêne, hende problemî nêameyêne meydan.

Enê çekuyan ra dîyar beno ke qismêkê muhîm yê çekuyan raşterast ferhegê ke verê cû amade bîyê ra kopya bîyê. Ferhengê ke verê cû amade bîyê, seba xebata ziwanî çimeyê muhîm ê helbet, labelê formê çekuyan ke ferhenganê verînan de qeyd bîyê, sey "formo standard" kodkerdişê înan raşt nîyo, ziwanî hetê mintiqaya xwu ser antişî yo. Çimkî ferhengê ke verê cû amade bîyê de zafê çekuyan fekê mintiqa yan zî fekê dewa ferhengasazî gore qeyd bîyê. Coka ganî krîterê standardîzekerdişî bi hawayêko zelal dîyar bibê, baş munaqeşe bibê, dima test bibê, eke ci ra tam bîyî emîn, o wext bi hawayêko şefaf tetbîq bibê.

Prosesê tarîxî de gelêk ziwanan ra çekuyî dekewtê ziwanê ma la tewr zaf çekuyê erebkî estê, feqet înan ser o yew xebate nêbîya, tesnîf nêbîyê. Kam çekuyan tesnîf keno? Hîna zaf kesê ke bi ziwanî emel kenê; kesê ke bi nezerê ziwannasîye ziwanî ser o xebitîyenê, îllahîm zî kesê ke nusnenê, ancax ê bieşkê derheqê fonksîyonelîya çekuyan de fikir beyan bikerê. Mesela, eke merdim çekuya "fîkr"î nênusno nêeşkeno tam fam bikero gelo sey "fîkr" yan sey "fîkîr" bêro kodkerdiş. Ancî, ancax kesê ke ziwanî nusnenê eşkenê îzeh bikerê ke sey "fîkr" kod bibo mehîzûrê xwu çî yo, sey "fîkîr" kod bibo se beno. Nêke ma se merdimê ke erebkî zanê biyarin bikerin endamê Grûbe, eke kirdkî de fealîyetê înanê wendiş û nuştîşî çînê bo, tu havîla xwu nêresena xebate.

Çekuyê erebkî ke dekewtê ziwanê ma, ma vajin sey çekuya "fîkr/فکر"î zafê înan yewhece yê. Qismêkê enê tewir çekuyan ferheng de sey eslê xwu qeyd bîyê. Nînan ra çend nimûneyî:

**aşk:** eşq (n)

**av:** seyda (n)

**ayıp:** eyb (n)

**bahis:** behs (n)

**devir:** dewr (n)

**eğim:** meyl (n)

**emir:** emr (n)

**felç:** felc (n)

**fîkir:** fikr (n)

**hüküm:** hukm (n)

**ışık:** şewq (n)

**kabız:** qebz (n)

**kalp:** qelb (n)

**kavim:** qewm (n)

**keyif:** keyf (n)

**kıyafet:** bedl (n)

**kuş:** teyr, -e

**metin:** metn (n)

**mülk:** milk (n)

**nefis:** nefis (n)

**nesir:** nesr, -e

**ömür:** *emr (n)*

**söz:** *qewl (n)*

**şeyh:** *şêx, -e*

**zulüm:** *zulm (n)*

Qismêk zî vengê "e/i/î/u/û" dekerdo mabeynê her di herfanê peyînan û sey dihece qeyd bîyê. Ma vajin sey:

**actmasızlık:** *xedir (n)*

**haciz:** *heciz (n)*

**öfke:** *qehir (n)*

**akıl:** *aqıl (n)*

**hapis:** *hepis (n)*

**övgü:** *wesfe (m)*

**beyit:** *beyte (m)*

**Kudüs:** *Quddus (n)*

**resim:** *resim (n)*

**bölüm:** *qisim (n)*

**kusur:** *uzîr (n)*

**sıfır:** *sifîr (n)*

**darbe:** *derbe (m)*

**kutup:** *qutube (m)*

**şekil:** *şekîl (n)*

**deney:** *cerib (n)*

**nakış:** *neqîş (n)*

**şîir:** *şîîre (m)*

**dibek:** *cirne (m)*

**nesil:** *nesil (n)*

**ufuk:** *ufûq (n)*

**fesih:** *fesix (n)*

**nutuk:** *nutîq (n)*

**yara:** *darbe (m)*

**fituk:** *fitîq (n)*

**oyun:** *reqîs (n)*

**yırtmaç:** *qeliş (n)*

Seke aseno, seba ke çekuyan ser o xebate nêbîya, çekuyî tesnîf nêbîyê û krîterê kodkerdişê (standardkerdiş) çekuyan keyfî yo, coka her kombîyayîş de bi hawayêk qeyd bîyê.

Ma bala xwu bidin çekuyanê yewheceyan ke erebkî ra dekewtê zıwanê ma. Çekuyê ke tede vengê "ew" û "ey" esto xwura nêbenê dihece. Çimkî herfê "w-y" vengê nermek ê, fonolojî de sey nîm-vengin hesab benê. Kirdkî de sey herfa pêrabestişî kewenê mabeynê venginan, ma vajin sey "*Gawo sûr hêgayê ma de çereno.*" Zafê fekan de vurîyenê benê yew veng: "ew>o" û "ey>ê". Ma vajin, çekuyanê sey "qewm>qom, xewf>xof" û "keyf>kêf, şeyx>şêx" de. Coka enê tewir çekuyî pêro bi hawayê yewhece qeyd bibê hîna raşt o.

Çekuyê bînî zî, belkî çend îstîsnayî xaric, zafê înan bi hawayê dihece kod bibê hîna baş o. Labelê bi şertê ke tenya halo sade de vengê "i" bikewo mabeynê her di herfanê peyînan, yanî neke sey "*fîkr*" ke ferheng de qeyd bîyo, sey "*fîkir*" binusîyo. Semedo ke çekuyê kirdkî halo sade de zî eşkenê sufîksê zafhûmarîye bigêrê, coka eke çekuya "*fîkir*"î sufîksê zafhûmarîye "-î" bigêro zî ancî gereka sey "*fîkir*" binusîyo. Û seba ke qismêko muhîm yê enê tewir çekuyan kirdkî de sey kar yenê gurenayîş, ma biwazin zî vengê "i" cayê xwu de maneno, ma vajin sey "*fîkirîyayene*". Labelê eke sufîksanê bînan bigêrê gereka vengê "i"yê mabeynê her di herfanê peyînan xwu bikero vindî. Mesela, sey "*Mi ê fîkrî ra hes kerd, fîkrê ci raşt o.*" Çekuyê sey "*Quddus, qutube, şîîre, ufûq, wesfe*" qeyd bîyê zî sey "*Qudis, qutib, şîîr, ufîq, wesif*" revîze bibê hetê standardîzasyonî ra hîna raşt beno.

Zafê enê tewir çekuyanê erebkî ma de sey kar zî yenê şuxilnayîş. Mesela, sey "*bedilîyayene, ceribîyayene, fetiqîyayene, fîkirîyayene, hewilîyayene, neqîşîyayene, terikîyayene, wesifîyayene...*"

Gama ke enê çekuyan ra sifetî virazîyenê zî "i" keweno mabeynê her di herfanê peyînan, ma vajin sey "*hukimkerdox*,<sup>29</sup> *zulimkar*".<sup>30</sup> Yanî zafê çekuyan de mecbûr herfa "i" kewena mabeynê her di herfanê peyînan û çeku bena dihece.

Êyê ke makî vajîyenê zî xwura vengê "-e" dusyeno peynî wa. Labelê enê tewir çekuyan de êyê makî zaf tay ê, belkî "beyte, derbe" û yew-di hebê bînî estbê, êyê bînî pêro nêrkî yê. Mesela, enê çekuyî pêro nêrkî yê: *bizr, cirm, cîsm, ekl, urf, erz, fecr, fehîm, ferq, feth, fexr, fîqh, hemd, heml, hezr, hubr, kelb, kenz, kîbr, kitm, kufr, lutf, meşq, neft, neql, nezm, nezr, nuks, qeht, qest, qirn, qism, qutf, remz, ricm, sebr, seth, şert, şukr, terk, terz, tîfl, xitm, zehr, zîhn, zîkr*...

Gereka merdim yew bi yew bala xwu bido awanî û fonksîyonê enê çekuyan ser ke zîwanê ma de senî şuxilîyenê, o gore ra, heba ke nêbena dihece tesbît bikero, ma vajin sey "*eşq, terz*" û sn. la înanê bînan hemîne krîtero ke seba çekuya "fikir" îzeh bi, o qayde kod bibê.

Bi hawayo ke ma hetanî nika çekuyî kod kerdê, seba ke krîterê ma keyfî yê, coka zaf eşkera yo ke xebata zîwanî xwu dir geleşeyêko cidî ardo, herinda ke ma sîstemê zîwanê xwu zelal û fonksîyonel bikerin ma teşqe dekerdo mîyan. Neke tenya çekuyê ke kokê xwu zîwananê xerîban ra yenê de problemî estê, bi eynî şekil çekuyê kirdkî zî zafê xwu xelet kod bîyê.

Kirdkî de vengê "ew" ke yew hece de vajîyeno tayê fekan de vurîyeno beno "o", mesela, sey "*girewtîş>girotîş, hewr>hor, kewçike>koçike, qewm>qom, sewt>sot, xewf>xof, vewre>vore*..."

Ma senî bizanin kamcîn veng raşt kamcîn deforme yo? Ma eşkenê çekuyê ke zîwananê bînan ra dekewtê zîwanê ma ra tesbît bikin. Ma vajin, çekuyê sey "*qewm, sewt, xewf*..." Erebkî de eslê xwu bi eno qayde yê, la tayê fekanê ma de sey "*qom, sot, xof*..." yenê vatiş. Yanî tayê mintiqayê ma vengê "ew" kenê "o".

Ma eşkenê lehçeyanê kurdî ra zî teyîd bikin. Mesela, kurmanckî de "*ewr* [hewr], *xewn* [hewn], *kevçî* [kewçike]". Ma eşkenê zîwananê îranî yê bînan ra zî teqîb bikin, mesela, fariskî de vanê "*ebr* [hewr]".

Tayê fekan de vengê "o" zî beno "ew" yan zî "we", mesela, herinda "*ortax*"î de vanê "*wertax*".<sup>31</sup> Xebata ma ya zîwanî de zafê çekuyan bi vengê "ew" standardîze bîyê. Ferheng ra çend nimûneyî:

<sup>29</sup> Vate, Kovara kulturî, Hûmare 6, r. 49

<sup>30</sup> Vate, Kovara kulturî, Hûmare 1, r. 84

<sup>31</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî), Weşanxaneyê Vateyî, Îstanbul 2005, r. 25

**acayıp:** *tewş, -e*

**devir:** *dewr (n)*

**kargış:** *zewte (m)*

**alma:** *girewtiş (n)*

**düş:** *hewn (n)*

**kavim:** *qewm (n)*

**Bingöl:** *Çewlîg (n)*

**düşme:** *kewtiş (n)*

**kayınbaba:** *vistewre (n)*

**bir:** *yew, -e*

**eğri:** *çewt, -e*

**kırk:** *çewres*

**bulut:** *hewr (n)*

**kar:** *vewre (m)*

**rüya:** *hewn (n)*

Labelê qismêk zî bi vengê "o" ameyê standardkerdiş:

**kaşık:** *koçike (m)* [ma vanê "kewçike (m)"]

**ayakkabı:** *sol (n)* [ma vanê "sewl (n)"]

**iyi etmek:** *hol* kerdene [ma vanê "hewl, -e"]

**o (z):** **o** [mıntıqaya Licê de tayê vanê "ew" tayê vanê "we"]

Seke aseno, eynî veng bi di tewirî standardîze bîyo, yanî enê tewir çekuyan de di standardî virazîyayê.

Ancî kirdkî de vengê "ey" ke yew hece de vajîyeno, o zî tayê mintiqayan de beno "ê", mesela, sey "beyntar>bêntar, deyn>dên, heykel>hêkel, keyf>kêf, keyna>kêna, mabeyn>mabên, meyman>mêman, şeyx>şêx, teyşan>têşan, veyşan>vêşan..."

Seba ke ma fam bikerin kamcîn veng raşt kamcîn deforme yo, eynî sey mîqyasê verînî, ma tayê çekuyan de bala xwu danê zıwanê eslî ser. Mesela, çekuyê "heykel, keyf, şeyx..."

Bi eno qeyde ma fam kenê ke vengê "ey" raşt o, "ê" deforme yo. Eke kirdan hemîne eno veng sey "ê" telafuz bikerdêne, problem çinê bi. Labelê tayê mintiqayî bi hawayê "ey" vanê, tayê zî kenê "ê". Ma vajin, mîyanê şarê ma de tayê vanê "sey/zey to yo" tayê vanê "sê/zê to yo", tayê vanê "ney" tayê vanê "nê", seba halê tewênaye yê zemîrê kesê diyinî tayê vanê "ey" tayê vanê "ê", bi eno qayde gelêk çekuyî estê.

Xebata ma ya zıwanî de qismêkê muhîm yê çekuyan bi vengê "ey" standardîze bîyê. Çend nimûneyî:

**ara:** *beyntar (n)*

**heykel:** *heykel (n)*

**keyif:** *keyf (n)*

**borç:** *deyn (n)*

**kapı:** *keyber (n)*

Labelê gelêk çekuyî zî bi vengê "ê" ameyê standardkerdiş. Çend nimûneyî:

**aç:** *vêşan, -e* [ma vanê "veyşan, -e"]

**kız:** *kêna (m), kêneke (m)* [ma vanê "keyna, -e, keyneke"]

**konuk:** *mêman, -e* [ma vanê "meyman, -e"]

**şeyh:** *şêx, -e* [Ehmedê Xasî vato "şeyx"]

**susak** (*susamış olan*): *têşan, -e* [ma vanê "teyşan, -e"]

**ara:** *mabên (n)*

Madem ke ma çekuyan standardîze kenê, miheqeq gereka ma bala xwu bidin awanîya çekuyan ra û bi yew tewir kod bikin. Nêke zafstandardî kewena zıwanî mîyan, hişê nuştoxan û qiseykerdoxan danê tîmîyan ro. Eke krîterê ma raşt û dîyar bo, êdî hewce nêkeno ma formê "keyna" yan "kêna", "meyman" yan "mêman" munaqeşe bikin û ray bidin hela kamcîn zêde rayan gêna.

Kitabê *Rastnuştişê Kirmanckî (Zazakî)* de wina nuşte yo: "Suffiksê '-ên'î manayanê cîya-cîyayan dano çekuyan. Mavajî ke mana '-den kalma', '-den yapılma' û '-daki'ya tirkî dano. Herinda nê suffiksî de tayê cayan de '-în' yan zî '-in'/'-en'/'-yen' vajîyêno. Meylê kombîyayîşî nînan ra formê '-ên'î ser o yo."<sup>32</sup> Yanî qerar dîyayo ke vengê "-ên" standard bo labelê sebebê tercîhkerdişî dîyar nêkerdo. Beno ke fekê Pîranî esas gêrîyayo, çimkî eno suffiks bi eno qayde ferhengê *Zazaca-Türkçe Sözlükyê Malmîsanijî* de zaf vîyareno.

Labelê esasê xwu de neke tenya suffiks, gelêk çekuyan de bi eno qayde vengê "î" beno "ê", mesela, çekuyanê sey "*amîn, asmîn, halîn, hingimîn, lîm, lîn, lîş, nîm, nîme, rîm, sîne...*" de. Enê çekuyî mintiqaya Pîranî de wina telafuz benê: "*amên, asmên, halên, hingimên, lêm, lên, lêş, nêm, nême, rêm, sêne.*"<sup>33</sup>

Çekuyê ke bi eno tewir tede vengê "î" beno "ê" ferhengê Grûbe de zafê xwu bi vengê "ê" sey "formê standard" qeyd bîyê:

**bal:** *hingimên* (n) [ma vanê "hengemîn"]

**demirden yapılma:** *asinên, -e* [ma vanê "asinîn"]

**geçen yıldan kalma:** *parên, -e* [ma vanê "parîn"]

**göğüs:** *sêne* (n) [ma vanê "sîne"]

**gök:** *asmên* (n)

**gümüş bilezik:** *bazino sêmên* (n) [ma vanê "bazino sîmîn"]

**ilk:** *verên, -e* [ma vanê "verîn"]

**irin:** *rêm* (n) [ma vanê "rîm"]

**kazan:** *lên* (n) [ma vanê "lî"]

**kir:** *lêm* (n), *lêş* (n) [ma vanê "lîş"]

**küçük kazan:** *nêmlên* (n)

**maya:** (*süt için*) *amên* (n) [ma vanê "amîn"]

**önsöz:** *vateyo verên* (n) [ma vanê "vateyo verîn"]

**şiş:** *sêxe* (m)

**tahtadan yapılmış derin kap:** *darên* (n) [ma vanê "darîn"]

**topraktan yapılma:** *herrên, -e* [ma vanê "herrîn"]

**üstteki:** *serên, -e* [ma vanê "serîn"]

**yarım:** *nêm* (n), *nême* (n) [ma vanê "nîme"]

**yuva:** *halîn* (n) [ma zî vanê "halîn"]

Seke aseno çekuya tewr peyîne (halîn) herçiqas ferhengê *Zazaca-Türkçe Sözlük* yê Malmîsanijî de sey "*halên*" zî vîyarena la ferhengê Grûbe de sey îstîsna bi şeklê "*halîn*" ameya kodkerdiş.

<sup>32</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnuştişê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005, r. 103

<sup>33</sup> Malmîsanij, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Deng Yayınları, İstanbul 1992



Nika ancî ma mîqyasê corînî gore tayê çekuyan de bala xwu bidin vengê "î" û "ê" ser ke gelo qenaetê ma kancînî ser hasil beno, kancîn raşt o.

Kurmancî vanê "darîn [darîn], hêlîn [halîn], hingivîn [hingimîn], jêrîn [cêrîn], jorîn [corîn], nîv [nîm], nîvçe [nîmçe], nîvî [nîme], parîn, pêşîn [verîn], pêrarîn, sîm, sîne, sîng [sîne], zêrîn [zernîn]..."

Fariskî de "nîm (نیم), sîm (سیم), sîne (سینه), sîx (سیخ)".

Bi eno qayde dîyar beno ke vengê eslî "î" yo, vengê "ê" deforme yo, yanî vengo vurîyaye yo. Coka bêhemd hişê merdimî de derheqê "standardîzasyon"î de persî virazîyenê ke gelo fekê mintiqa esas gêrîyayo. Eke fekê yew mintiqa esas gêrîyeno, o çax, gereka sere de îlan bibo û her çî de bi hawayêko muntezem rîayetê fekê a mintiqa bibo. Labelê standardîzasyon de fekê yew mintiqa esas girewtiş hem raşt nîyo hem zî ma nêşkenê bidin qebûlkerdiş.

Ziwan de "standardîzasyon" yeno manaya netîceyê muşahede û wekenitişî de bi hawayêko sistematîk û pêgîrewte dîyarkerdişê şekil û bîçimê çekuyan. Mesela, kirdkî de sufiksê "-ge" esto, name û karan ra name virazeno, ma vajin sey "adir+ge=adirge, ber+ge=berge, bin+ge=binge, qerar+ge=qerarge, seyran+ge=seyrange".

Tena sereyê xwu sey bestox zî esto, sey "ge, ge-ge". Labelê tayê çekuyan de êdî bîyo parçeyê kokî, ma vajin sey "berenge, dezge, merge..."

Eslê xwu de vengê "h" peynî de esto, mesela, kurmancî de vanê "geh", fariskî de zî "gah/geh" o labelê seba ke kirdkî de exlebê xwu vengê "h" yê peynîya çekuyan beno vîndî, mesela, sey "ca[h], gune[h], padişah[h], şa[h]" coka ma de sey "ge" yeno vatiş. Eno xisûsiyet neke aîdê fekê yew mintiqa, kirdkî de umûmî yo. Labelê xebata standardîzasyonî de bi di tewirî gêrîyayo. Ma vajin, enê çekuyanê cêrînan de sey "-ge" kod bîyo:

**bazen:** ge, ge-ge, ge-gane

**dayanak:** bing (n)

**esasi:** bingeyên, -e; bingeyî

**çakmak** adirge (n)

**dink:** dinge (m)

**çayır:** merge (m)

**esas:** bing (n)

Labelê tayê çekuyan de zî sey "-geh" kod bîyo, ma vajin, enê çekuyan de:

**atölye:** kargeh (n)

**fidanlık:** leyegeh (n)

**çevre:** cugeh (n)

**işletme:** sazgeh (n)

**çit kapısı:** berge (n), berenge (n)

**karargâh:** qerargehe (m)

**danışma:** [danışma yeri] agahdarîgeh (n)

**mahkeme:** dadgehe (m)

**dayanak:** 1) îstînadgeh (n) 2)binge (n)

**tezgâh:** dezgeh (n)

Tîya de yewna problem zî eno yo ke çekuyê "qerarge[h]" û "dadgeh[h]" makî kod bîyê, oxro ke bi sufiksê "-ge[h]" name ra nameyê cayî virazîyeno û "ca" zî nêrkî yo. Xwura ha çekuyanê bînan de îfade bîyo, mesela sey "**danışma:** [danışma yeri] agahdarîgeh (n)". Coka bi sufiksê "-ge[h]" sey makî

kodkerdişê çekuyan sîstemî seqet kerdo. Eslê xwu de meselaya "makî" kodkerdişê çekuyan de zî gelêk problemî estê. Ma do bala xwu bidin problemê makîyîye ser zî.

Xebata ziwani de çîyo raşt eno yo ke ma tamamê fekanê xwu bi hawayêko bitûn bifikirîyê û bi hawayêko komplîke sîstemê ziwani esas bigêrin. La çîyo muhîmtir, kam ke enê karî keno muheqeq gereka bi dîqetêko zaf taybet û xorîn bikero. Xebata ziwani gereka munaqêşe û krîtîkî rê akerde bo. Heto bîn ra ma heme gereka xwu wezîfedar bivînê ke xebata ziwani de raştkerdişî ser ardimkar bin. Çimkî ziwani, yê ma hemîne yo, eke yew xeletîya qiceke bikewo ziwani mîyan ma se serrî nêşkenê mîyan ra vejîn. Helbet ma eşkenê xebate û xebatkarane ziwani teqdîr bikin labelê mubalexeyê terefgîrane, ancî yew xebate zêde ra teqdîs kerdiş, êyê bînan rencîde kerdiş de tu fayde û xeyr çinê yo.

## Standardîzasyon û Cinsîyet

Neke tenya kurdî de zafê ziwani de cinsîyet esto, yanî zaf ziwani de çekuyî nêrkî, makî û zafhûmar ê. Lînguîstî hemfikir ê ke eleqeyê nêrkî û makîti bi teberê ziwani çinê yo, zereyê sîstemê ziwani ra eleqedar o.

Wexto ke ma kirdkî de ewnîyenê sîstemê nêrkî-makîti ra, çîyo ke bi hawayêko muşexes xwu nîşan dano, çekuyê ke bi herfa bêvenge qedîyenê heme nêrkî yê, sey "*ber (n), dar (n), hewr (n), rez (n), vaş (n)*".

Kirdkî de tayê çekuyê ke bi venginan qedîyenê la ancî nêrkî yê zî estê. Ma vajin çekuyê sey: "*bira, ca (n), ga (n), zama (n), estare (n), gule (n), goşare (n), goşe (n), rî (n), do (n), ko (n), ro (n), dû (n)*". Labelê esasê xwu de peynîya enê tewir çekuyan de vengî estbîyê. Mesela, enê çekuyanê nêrkîyan ra qismêk fariskî de wina yê: "*birader, cah, gaw[nêr], damad, sitareh, golûleh, goşavareh, goşeh, çehrih, dox, koh, rodxane, dûd*". Kurmancî de "*cih, dew, robar, duxan, rîh*".<sup>34</sup>

Kitabê *Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)* de winî nuşte yo: "*Kirmanckî de name û sifetê makî yê ke şîweya Dêrsimî de bi '-e' qedîne, tayê cayan de bi '-i', tayê cayanê bînan de zî bê '-e' û bê '-i' vajîyênê*".<sup>35</sup> Labelê eno tesbît nîmçet yan zî problemin o. Çimkî neke tenya şîweya Dêrsimî de sewbîna mintiqayan de, ma vajin Licê de, Pasûr de zî bi "-e" qedîyenê. Ê vurîyayîşê vengê "-e" bi "-i"yî, neke tenya çekuyanê makîyan de nêrkîyan de zî eynî yo. Yanî çekuyanê nêrkîyan de zî vengê "-e" vurîyeno beno "-i", ma vajin, çekuyê sey "*Hêni (n), huyi (n), mêrdi (n)*"<sup>36</sup>

Yê diyin, fikrê *tayê cayanê bînan de bê "-e" û bê "-i" vajîyenê* raşt nîyo. Eke fekê Çewlîgî qest beno, o çax ma nîzdî ra biewnîn fekê Çewlîgî ra. Raştê ci sufiksê makî "-e" vîndî nêbeno. Seba ke sey

<sup>34</sup> Roşan Lezgîn, Dersê Ziwani (Kirdkî, Kirmanckî, Zazakî, Dimilkî), Weşanxaneyê Roşna, Çapê 2., Diyarbekir 2014, r. 27

<sup>35</sup> Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005, r. 40

<sup>36</sup> Malmîsanij, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Deng Yayınları, İstanbul 1992

xisûsîyetêko karakterîstîk fekê Çewlîgî de çekuyî hes kenê bi bêvengan biqedîyê coka peynî de venginan nêwazenê. Bêvengê peynî vengina tewr peyîne gênê erzenê peyê xwu.

Ma vajin, fekê Çewlîgî de gama ke halê sade de vanê "keerg (m)", eslê xwu de vanê "kerge". Seke aseno, vengê "-e"yê peynî apey şîyo kewto peynîya bêvenganê "rg" ke yew hece de vajîyenê. Yanî merdim vano qey fekê Çewlîgî de çekuyê makî "bê '-e' û bê '-i' vajîyenê" labelê winî nîyo. Mesela, çekuya "keerg" de semedo ke di vengînî (e+e) ameyê têhet, coka her di net nêşnawîyenê. Labelê bêke laburatuwar de tesbît bibo, merdim bi goşan zî zaf asan fam keno ke "e" yew nîyo. Mesela, çewlîgijî wexto ke vanê "ber" û wexto ke vanê "kerge", vengê "e" eynî nîyo; çekuya "ber" de tenya yew veng o, çekuya "keerg" de "e" qasê yew veng û nîmî derg o. Coka merdim vano qey çekuyê makî bê "-e/-i" vajîyenê.<sup>37</sup>

Fekê Çewlîgî îzafe de zî winî yo. Ma vajin "goştê kerge", fekê Çewlîgî de sey "gweşt keerg" vajîyeno. Çekuya "goşt"î halo sade de zî sey "gweşt" vajîyena çimkî fekê Çewlîgî de vengê "ew/we" beno "o", la vengê "o" zî beno "ew/we".

Xebata standardîzasyonî de seba çekuyanê makî vengê "-e" sey standard tercîh bîyo la tayê çekuyan de sey "-i" zî standardîze bîyo. Mesela, çekuya "**Siverek: Sêwregî (m), zavallî: feqîra meheyri (m)**" de.

Xulase, gereka sîstemê zîwanî pêkewte bo. Eke seba çekuyanê makî sufîksê "-e" tercîh bîyo, otomatîkmen seba heme çekuyan eynî bo. Helbet zîwan de îstîsnayî benê la tîya de xeletîya kodkerdişî esta.

Derheqê nêrkî-makîti de eke ma krîter munaqêşe bikin zaf feydeyê xwu beno. Mi gore, eke yew çeku tayê mintiqayan de makî tayê mintiqayan de nêrkî vajîyena, kodkerdiş de ma formê nêrkî tercîh bikin hîna baş beno. Çira? Çimkî şuxilnayîşê çekuyanê nêrkî hîna asan û ekonomîk o. Mesela, çekuya "mektebe (m)" ma het makî, fekê Pîranî de nêrkî ya. Seba asankerdişê sîstemê zîwanî ma formê nêrkî tercîh bikin hîna baş o. Sebeb? Nika ma yew cumle saz bikin, sedem bi xwu eyan beno:

"*Mektebe virazîyaye.*" (m)

"*Mekteb virazîya.*" (n)

Seke aseno, yew cumleya tewr basîte ke di çekuyan ra ameya pê de bîle, mabeynê makî û nêrkîti de hîrê herfî ferq kenê. Bi eno qayde ma fam kenê ke çekuyê nêrkî nîsbet bi çekuyanê makî ekonomîktir ê; qiseykerdiş de, nuştîş de; wext de, qirtasîye de. Seke cumle ra aseno, yew metin de se çekuyê makî

---

<sup>37</sup> Zemanê Roma/Bîzans de matematîk aver nêşîyo, çimkî "reqemê roma" kirarîyanê matematîkî rê fonksîyonel nîyê. La reqemê latînî kirarîyanê matematîkî rê zaf kêrameye yê.

Mîyanê fekanê kirdkî de o ke nuştîşê ci tewr zehmet fekê Çewlîgî yo. Ser û sebebê ci zî xisûsîyeto ke çekuyî nêwazenê bi venginan biqedîyê. Qet nêbo eke "zîwanê nuşteki" de venginan peynîya çeku ra nêvejê nêkerê peyê bêvenganê peynînan, zehmetîya warê nuşteki de bikarardiş û famkerdişê fekê Çewlîgî nêmanena. Fekê Çewlîgî ser o tetbîqkerdişê enê qaydeyî "mudaxele" nîyo, menfaetê fekî de "îslehet" o. Eynî sey reqemanê roma ra vîyartîşê reqemanê latînî.

her yewe yew rey bêro şuxilnayış, hîrê sey herfî zêde nusîyenê. Yanî metnê ma yew rîpel zêde nusîyeno.

Yewna xeletî zî ena ya ke standardîzasyon de çekuyê makî yê ke bi "-î" qedîyenê de îlaweten "-ye" ser o ameyo zêdnayış, mesela, sey "**havlu**: xewlî (m), xewlîye (m), **hotoz**: kofî (m), kofîye (m)".

Standardîzasyon de zafê çekuyan bi eno qayde ameyê kodkerdiş labelê "ferheng" de têmîyanek rêz bîyê, yanî ge "-î" vernî de ge "-îye" vernî de yo. Mesela, wina:

**acılık**: 1)talî (m), talîye (m)

**açıklık**: zelalî (m), zelalîye (m)

**adamlık**: merdimîye (m), merdimî (m)

**ağırbaşlılık**: giranîye (m), giranî (m)

**ahmaklık**: kavîye (m), kavî (m)

**amca karısı**: nacıye (m), nacı (m)

**aydınlık**: roşnîye (m), roşnî (m)

Tayê çekuyî tenya bi formê sufiksê "-î" kod bîyê, mesela sey:

**hovardalık**: tolazî (m), çimteberî (m)

**hükümsüzlük**: betalî (m), nêvîyarteyî (m), bêhukmî (m)

**ışık**: roştî (m)

Tayê zî tenya bi formê sufiksê "-îye" kod bîyê, mesela sey:

**amirlik**: amirîye (m)

**anonimlik**: anonîmîye (m)

**at kuyruğu**: terrîye (m)

Seba ke mesela fam bibo tenya mi çend nimûneyî nîşan dayî, ferheng de bi hezaran çekuyî winî têmîyanek kod bîyê. Seke aseno, sufiksê "-îye" şuxilnayışê çekuyanê ma giran keno. Eke ma sufiksê "-ye" îlaweyê çekuyanê makî ke bi herfa "î-" qedîyenê nêkerin tu problem nêvejyeno. Çimkî ferqê sufiksê makî "î" û sufiksê zafhûmarîye "-î" teqil (vurgu) ra zaf zelal fam beno.

Ziwan çiqas sade, çiqas ekonomîk bo hende asan yeno qıseykerdiş, nuştış, mûsnayış û mûsayış. Gereka "meyl" asanîye ser bo. Tam tîya de ez wazena dîqetê ma şiro yewna nuqta ser. Xebata zıwanî de wexto ke "meyl" ronîyeno gereka îzehê xwu zî bibo. Gereka sedemê "meyl"î bidîyo zanayış, çîyo muhîm gereka mentiqî bo. Yanî raşt nîyo ke ma vajin "meylê kombîyayış" û her çî biqedîyo, dima zî ma vajin "*Biewnî ferheng ra!*"

Nika ma *biewnî ferheng ra*; ma vînenê ke hûmarêka zêdîye çekuyê ke zafê mintiqayan de nêrkî yê, ferheng de sey makî ameyê kodkerdiş:

**adres**: adrese (m)

**afet**: afate (m)

**afi**: zerpe (m)

**ağaç boğumu**: mobika dare (m)

**akçakavak**: darsipe (m)

**akkavak**: darsipe (m)

**alerji**: alerjî (m)

**alıştırma**: temrîne (m)

**antlaşma:** peyman (m)

**aralık:** kanûne (m)

**atlas:** atlase (m)

**apışlık:** pêşe (m), keşe (m)

**arazi:** erazî (m)

**atom:** atome (m)

**at arabası:** parxêle (m)

**aşama:** merhele (m)

Tenya madeyê "A" de enê estê. Esas tamamê ferhengê de bi seyan çekuyî estê ke nêrkî yê feqet makî ameyê kodkerdiş. Çend hebê ke ameyî mi vîr: "alete (m), bezra (m), cêbe (m), çamure (m), çape (m), Çêrmûge (m), dadgehe (m), debaxe (m), dinge (m), donime (m), ekîpe (m), êlege (m), grûbe (m), helîsa (m), hewane (m), kakile (m), kapuşone (m), kaxite (m), koxe (m), kurke (m), motore (m), muamele (m), qedehe (m), qelemtiraşe (m), qerargehe (m), qirşûqale (m), qutube (m), şeçe (m), tone (m), wesfe (m), xerîta (m), xîlafe (m), xirxale (m), zewte (m), zure (m)..."

Enê çekuyî pêro hetê ma de û zafê mintiqayanê bînan de zî nêrkî yenê vatiş. Herinda ke ma zıwanê xwu bikin sivik û asan, ma zıwanê xwu bikin fonksiyonel, ma xebata standardîzasyonî de bi "meylê kombîyayîştî" sîstemê zıwanê xwu bêter kerdo giran!

Mîyanê çekuyanê ke makî kod bîyê ra tewr zêde bala mi şina nameyê aşman ser. Labelê eno mîyan de ez wazena ma pîya bala xwu bidin çekuyanê nameyê wextan ser.

Mesela, çekuyê sey "aşme, deqa, esna, game, hele, hûnike, lehza, mence, roje, saete, salîse, sanîye, serre, vîstike" makî yê.

Nameyê sey "bazar, çarşeme, çile, dem, edar, esir, êre, gulan, hamnan, hewte, hezîran, îne, kanûno peyîn, kanûno verîn, keşkelûn/îlûn, kirê, mewsim, mîlad, mîyanroj, nîsan, pancîyes, panşeme, par, payiz, pêrar, perarey, perey, peroj, qirin, sêşeme, siba, sibat, şan, şefeç, şeme, şewdir, tebox, temûz, teşrîno peyîn, teşrîno verîn, verhel, vereşan, vizêr, wesar, wext, yewşeme, zaman, zimistan" pêro nêrkî yê.

Gelo zıwanê ma de eno zî yew sîstem o? Merdim nêşkeno tam çîyêk vajo la gereka ser o bişuxilîyo, belkî fam bibo. Xebata standardîzasyonî de eke çekuyî enê hetî ra zî bêre tesnîfkerdiş, merdim eşkeno hîna raşt kod bikero.

Xebata standardîzasyonî de kodkerdişê nameyê aşman de çend problemî estê. O verîn, nameyê aşman sey makî kod bîyê:

**ocak:** (ocak ayı) çele (n) [Ma het "kanûno peyîn (n)"]

**şubat:** sibate (m), guciçe (m) [Ma het "sibat (n)"]

**mart:** adare (m) [Ma het "edar (n)"]

**nisan:** nîsane (m) [Ma het "nîsan (n)"]

**mayıs:** gulane (m) [Ma het "gulan (n)"]

**haziran:** hezîrane (m) [Ma het "hezîran (n)"]

**temmuz:** temmuze (m) [Ma het "temûz (n)"]

**ağustos:** tebaxe (m) [Ma het "tebox (n)"]

**eylül:** êlule (m) [Ma het "keşkelûn/îlûn (n)"]

**ekim:** *teşrîna verêne (m)* [Ma het "teşrîno verîn (n)"]

**kasım:** *teşrîna peyêne (m)* [Ma het "teşrîno peyîn (n)"]

**aralık:** *kanûne (m)* [Ma het "kanûno verîn (n)"]

Kamca de nameyê aşman makî yê? Ferhengê *Zazaca-Türkçe Sözlük* yê Malmîsanijî de enê estê: "*sıbatı/d, adar, nisani/d, gulani/d, heziran-ı/d, temmuzı/d, tebaxı/d, êlul-ı/d*".

Seke aseno "adar" xaric êyê bînî pêro makî yenê vatiş. Esasê xwu de Pîran de nameyê aşman nêrkî yê, tenya çend dewê cêrê Pîranî winî makî vanê la xebata standardîzasyonî de êdî bîyê umûmî. Labelê ancî pênegirewtiş (tutarsızlık) esto; eke ma nameyê aşman makî kod kenê, o wext gereka sîstemê xwu pêkewte bo, yanî gereka pêro makî bê. Qey 11 aşmî makî 1 nêrkî bo, îzehê xwu çi yo?

Mintiqaya Licê de û mîyanê tamamê kurdan de "*çile (n) nameyê aşme nîyo, nameyê wextêkê mueyen yê 40 rojanê zimistanî yo; 11ê kanûnê verînî ra dest pêkeno heta 20ê kanûnê peyînî dewam keno. Yanî 20 rojê kanûnê verînî û 20 rojê kanûnê peyînî benê çile*".<sup>38</sup>

Nameyê "temmuze" de problem eno yo ke bi di "m"yan ameya nuştiş la vengê "u" sey fekê Pîranî kod bîyo. Eslê xwu sey "تَمُّوز" [temmûz] a. Labelê kurdî "m" bi şedde nêvanê. Mesela, eslê çekuye "محمد" [Muhammed] o, la kurdî "m" bê şedde vanê, sey "Mihemed/Mehemed" telafuz kenê.

Çekuya "êlule" de zî problem vengê "ey" o, çimkî eslê çekuye sey "أيلول" [eylûl] o. Vengê "u" zî ancî sey fekê Pîranî kod biyo.

## Netîce

Xulase, enê pêro nakokîyê zaf cidî yê xebata standardîzasyonî dir kewtî zıwanî mîyan. Mi waşt tenya çend nimûneyan nîşan bidî. Yanî sewbîna xeletîyê muhîmî zaf estê ke bi xebata standardîzasyonî nêkewenê, teşqe le xwu dir ardo. Înşalah ez do dima bala xwu bidî ser. Labelê ez enê vajî, eke xeletî kewte mîyanê zıwanî raştkerdişê ci zaf zehmet o!...

Hêvîya mi ena ya ke ma ageyrin pirêzeyê xwu ser, xeletîyanê xwu raşt bikerin. Çimkî heqê ma çinê yo ma neslê xwu dimayî rê hende gelemşe û teşqe le verdin.

---

<sup>38</sup> Roşan Lezgîn, Mintiqaya Licê de Nameyê Mewsiman û Aşman, Newepel, Rojnameyo kulturî, Hûmare 95, r. 7

## ÇİMEYÎ

- *Atatürk ve Türk Dili*, 2. Cilt, TDK Yay. Ankara, 1997
- Doç. Dr. Hülya Pilancı, *Türkçe Ses Bilgisi*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2017
- Dr. İsmail Bangi, *Farsça Dilbilgisi (Gramer)*, Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yay. Ankara, 1971
- Ehmedê Xasî, *Mewlûdê Kirdî*, Metbeaya Lîtoğrafya, Diyarbekir, 1899
- Falih Rıfki Atay, "Atatürk ve Türk Dili" Dilcilere Saygı, Derleyen: Hikmet Dizdaroğlu, TDK Yay. Ankara, 1966
- Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnuştişê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005
- Malmîsanij, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Deng Yayınları, İstanbul 1992
- *Osmanlı Türkçesine Giriş - I*, Anadolu Üniversitesi Yayını, Eskişehir, 2017
- Prf. Dr. Hayati Develi, *Osmanlı Türkçesi Kılavuzu - I*, Kesit Yayınları, İstanbul, 2009
- Roşan Lezgîn, *Dersê Ziwanî (Kirdkî, Kirmanckî, Zazakî, Dimilkî)*, Weşanxaneyê Roşna, Çapê 2., Diyarbekir 2014

## KOVARÎ

- *Sosyal Bilimler Dergisi*, SDÜ Fen-Edebiyat Fakültesi, Yıl: 1999, Sayı: 4
- *Vate*, Kovara kulturî, Hûmare 1, 6, 43, 50

## ROJNAMEYÎ

*Newepel*, Rojnameyo kulturî, Hûmare 95

## KEYEPELÎ

[dersiminfo.com](http://dersiminfo.com)

[www.zazaki.net](http://www.zazaki.net)